

BERBANG

KOVARA FEDERASYON A KOMELE YÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ

BIMRE CUNTA FAŞIST Û KOLONIYALIST



BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet- Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Tigris
Layout och sättning : Cotkar och Gundi.

ADRESS

Kurdiska Riksförbundet Rissneled
ed 55, NB
172 44 Sundbyberg/ Sweden

Prenumeration: Medlemmar 50 kr.
/ år övriga 100 kr/ år
Postgiro: 643880-8

BERPÏRSIYAR :

A : TIGRIS

REDAKSIYON :

BAVÊ NAZÊ

S. QERECDAK

C. ŞERO

MUÊYED TEYIB

BRÎNDAR

PERGALA RÛPELAN

COTKAR Û GUNDÏ

BERBANG

Kovara kurdi, xwedi: Federasyona
Komelên Kurdistanê li Swêdê
Biha: 5 kronê swêdê
Abone: sal 50 kron

NAVNISAN

Berbang, Rissneleden 55 NB
172 44 Sundbyberg/ Sweden
Postgiro: 64 38 80-8

naveroka

vê

hejmarê

<i>BÎLANÇOYA CUNTA FAŞIST, LI TIRKIYÊ</i>	3
<i>A. Tigris</i>	
<i>LI SER HILBIJARTINA GIŞTIYA LI SWÊDÊ, BI PARTIYAN RE CIVÎNEK</i>	4-5
<i>C. Şero</i>	
<i>LI SWÊDÊ ENCAMA HILBIJARTINA GIŞTÎ</i>	6
<i>E. Cotkar</i>	
<i>LI AFRIKA BAŞÛR ÇI DIQEWIME</i>	7-8
<i>Betal Eziz</i>	
<i>SAVAK Û ZINDANA EVINÊ</i>	9
<i>Rêber</i>	
<i>YILMAZ DI NAV ME DE YE</i>	10
<i>Bavê Nazê</i>	
<i>DIVÊ KURD Î. BEŞIKÇI JI BÎR NE KIN</i>	11
<i>Bênav</i>	
<i>JI FEDERASYONE Û KOMELÊN ENDAM NÛÇE Û BÛYER</i> ..	12-13
<i>PÊNC SALIYA DIKTATORIYA FAŞIST HAT PROTESTO KIRIN</i> ...	14-15 16-17
<i>S. QRECDAX</i>	
<i>Berswa "Rexne"</i>	
<i>NÎJADPERESTIYA BERBANGÊ Û ÎNTERNASYONALÎZM</i> ...	18-19
<i>A. Tigris- Brindar- S. Qrecdax</i>	
<i>JI KURDISTANÊ NÛÇE Û BÛYER</i>	20-21
<i>FERHENGA BERBANGÊ</i>	22-23
<i>DU HELBEST</i>	23
<i>Muêyed Teyib</i>	

BILANÇOYA 5 SALIYA

CUNTA FAŞİST

A. TIGRIS

Cunta Tirk a faşist, dı roja 12 ê İlonê de pênc saliya xwe tije kr û kete sala şeşan. Cunta faşist ji bo pelçiqandin û rûçikandina gelên Tirkîyê û yên Kurdistanê, şev û roj lı xwe kır yek. Bı alikari û aqlmendiya Amerika Yekbûyi, CIA û welatên endamên NATO bingehên siyasi, abori û civaka Tirkîyê û Kurdistanê ji A'yê hetani Z'yê guhart. Dewleta leşker, polis û noker hat avakirin. Dewleta kolonyalist a Tirk ji aliyê bingehi, naverok û teşevê hat guhartin û dewleta faşist dan rûniştandin.

Cuntayê ji bo pêk anina vê dewleta faşist, dı seri de êrişê parti û hêzên şoreşger û welatparêzên Tirkîyê û Kurdistanê kır. Pey re êrişê hêz û rêxistinên demokratik û welatparêz kır. Armanca cuntayê, ji navê rakirin û belavkirina wan hêzên şoreşger û anti-faşist bû. Cunta û aqlmendên wê baş dızani bûn, ku hetani ew hêz û rêxistinên anti-faşist hebûn, hatin û rûniştina rejima faşist ne mumkun e. Cuntayê wê demê ji jêrbûn û belavbûna hêzên şoreşger û anti-faşist fersend dit. Bı plan û program lı wan hêzan xıst û bı serket. Cuntayê wê plan û programa xwe bı kurtayi wiha bı kar ani:

Cuntayê dı tevayiya Tirkîyê û Kurdistanê de rewşa awerte diyar kır. Dest da ser rêxistinên demokratik. Berpirsiyar û endamên wan girt. Dı navbera çend mehan de lı Tirkîyê û lı Kurdistanê hejmar gurtiyan 50 hezari dit. Dest da ser malên rêxistinên û yên endamên wan. Cuntayê qanûna himi ji navê rakir. Parlamentoya burjuvazi belav kır. Memûrên demokrat û pêşverû ji meqamên resmi dūr xıst û piraniya wan ji kar avêt. Dı şûna wan de leşker û sivilên faşist tayin kır. Ji bo kar û qezencên monopolên Tirk û yên navnetewi biryara "24 ê Çile" bê kêmasi û bê problem, bı awaki hêsa pêk ani. Ew qanûn beri derketi bû lê nıkari bûn bê kêmasi bı ci binin. Piyasa pere serbest kırin û bihayê pereyê tirk daxıst jêr. Enflasyon û devolasyon bilind û zêde bûn. Lı Tirkîyê, enflasyon dı salên 1981 ê de % 45, 1982 an de %37, dı 1983 % 40, dı 1984 an de %50 û dı sala 1985 an de ji heta iro, ji %60-65 i da neketiye jêr. Buhabûn bê hed û bê hesab e! Lı Tirkîyê naneke 450 grami dı sala 1980 i de 6 lirayê tirk bû; dı 1985 an de naneke 400 grami derket 60 lirayê tirk. Kiloke goşt dı sala 1980 i de 370 lira, niha (1985) 1500 lira, kiloya birincê dı sala 1980 i de 39 lira, niha 400 lira, tona komrê ji 2200 lirayi derket 20.000 lirayi. Rojnamek ji 6 lirayi derket 80 lirayi ûhw.....Lê mehani û destmiza karker û memûran wek xwe ma. Dı nav 5 salan de bêkari tam dı % 50 zêde bû. Ji ber bêkari û birçibûnê hejmara jinên fahişê gelek bilind bûn. Lı gor statistikên fermi, beri hatina cuntayê jimara jinên fahişê 2000 bûn. Lê piş-

ti 12 ê İlonê ango bı hatina cuntayê re ev hejmar derket 230.000 i. Ev hejmar yên ku eşkera bûne, bê guman hejmar yên dızı gelek bilind e. Disan lı gor statistikên Tirkîyê ku ew ji dı bin kontrola cuntayê dane; dı nav van 5 salên dawi de qezenca sermayedarên mezin û monopolan dı %70-80 zêde bû.

Cuntayê dı vê demê de desteki xwe ji dirêjê nav kar û barên hindekari û perwerdekariyê kır. Leşkerên faşist ketin nav dibistan û zaningehan. Dı derheqê 10 hezar mamostên endamên komela mamostan "TOB-DER" ê de dawe vekirin. Piraniya endamên komela mamostan ji kar avêtin. Berpirsiyarên wan avêtin girtigehan. Ji bil komela mamostan qasi 1500 kes profesor û dersdar ji dibistanên bilind û zaningehan avêtin, an ji bı zorê dan istifakirin. Ji bini ve hemû pirtûk û metaryalên dibistanan guhartin. Dı dibistan û zaningehan de sistema faşist da rûniştandin. Ji aliki din ve dest da ser hemû çapxaneyên pêşverû. Milyoneke zêdetir pirtûk, kovar û rojname berhev kiran. Tenê bı cariki de 133.607 pirtûkên çapxana Bilim Ve Sosyalizm girt û şewitandin.

Niha dı zindanên cunta faşist de ji 30.000 i zêdetir şoreşger û welatparêz hene. Ji destpêkê heta niha lı Kurdistanê û lı Tirkîyê ji milyonek zêdetir kes dı destên leşgerên cuntayê de derbas bûn û eşkence ditin û kotek xwarin. Bı haweki fermi, cuntayê heta iro 51 kes bı dar de (idam) kır. Dadgehên cuntayê biryarên bı dardekirina gelek kesi ji dan. Ew kes iro lı ber rêza bı darde kirina xwe ne. Dadgehên faşist hin ji 1000 kesi re ji cezayên bı darde kirinê dixwazin. Cunta faşist ji bil van, bê hejmar kesên şoreşger û welatparêz dı kemin û dı girtigehan de ji kuşt. Bı hezaran kut kır, leng kır û din kır....

Cunta faşist lı gor qanûnahimi hemû qanûnên kevn ji navê rakir û yên faşist pêk ani. Ji wan qanûnên nû du heb ji, dı vê sala dawi de derxıst. Yek ji wan ya lı ser navê Poşmaniyê ye, ku dı bingehê xwe de ya nokeriyê ye. Kijan şoreşger û welatparêz çaxa poşman bibe; hevalên

xwe, rêxıstina xwe bide dest, ew çax cunta wi/wê dibexşine û diyari dide. Qanûna din ji ya pois e. Vatini û berpirsiyariyên polis zêde bû. Wilo bû, ku polis kare bê pirs mirov bukje û ne meqam û ne kes ji nıkara jê pirs û hesap bıke.

Bêguman û bêraberzın, cunta faşist, dı van pênc salan de giraniya xebata xwe ya heri mezin û dijwar da ser Kurdistanê. Ordiya xwe ya duyemin ji hêla Tirkîyê kışand Kurdistanê. Niha qasi 250 hezar leşkerê ordiya dagerker, lı ser axa Kurdistanê ne. Cuntayê dı vê demê de lı piraniya bajar û navçên Kurdistanê balafirgehên leşkeri çêkir. Cebilxaneyên NATO yên nukleer lı Kurdistanê bı ci kır. Bı alikari û piştgriya wan hêzan tamamê Kurdistanê da ber operasyonên leşkeri. Cunta dı çend mehan de carek provayên tadbıqatên kurd qırkırinê pêk tine. Tıxûbên ku bı alikariya dewletên imperyalist, dı nav her çar dewletên kolonyalist de hatı bûn kışandın, cunta ji nû ve mayın dıke. Bı seran ser elektrik dıkşine. Dorhêlên tıxûb bı kilometran vala dıke û gundiyan kurd, koçbarê Anadolê dıke. Cunta êrişkar du car êrişê perçeyên Kurdistanê din ji kır.

Ordiya dagerker, lı her gund û navçeyên Kurdistanê qereqol û qşleyên leşkeri çêdike. Hevsarkêşê cuntayê hukmeta Turgut Özal, 50 girtigehên modern çêdike. Ji derê keyayên gundan, ji her gundi 2 kesi bı çek û cihaz dıkın ku lı dij şoreşger û welatparêzan bıkar binin. Ji bo lı dij karanina şoreşger û welatparêzan lı hnek kes û eşiran çek belav dıke.

Kırin û bûyerên cunta faşist wısa pır û barbar ın, ku mirov nıkare binivise û bı zıman ke. Bı rasti cunta iro gelek bı hêz e. Lê naye wê manê ku cunta nakeve û napelşe. Zorkeriya faşizmê qozê dawi yê burjuvaxiyê monopol e. Kesên şoreşger dı van rojên tari û teng de bı hêvi û bıguman ın. Divê û pêwıst e, tekoşinê hin ji geş bıkin. Ji Hitler hêztir faşist tıne bû. Wi tewayiya Ewrûpayê girt û dager kır. Lê dawiya wi, rejima wi çı bû? Wek kûçık dı koxıka xwe de cehemi.

lî ser hîlbijartîna gîştî lî Swêdê;



Nûnerên Partiyên dî seminerê de ditînen xwe diyar dîkîn.

BI PARTIYAN RE CIVÎNEK

C. ŞERO

Dî sala 1985 an de, lî swêdê hîlbijartîna gîştî pêktê. Hîlbijartîna dî 15 îlonê de jî bo beledîyan, Welayetan û parlamento yê ye. Lî Swêdê hîlbijartîna gîştî jî sê (3) salan çarek e. Lî gor hînek lîkolînan dî %90 kes beşdarê hîlbijartîna dibe. Ev hejmarê lî welatê ewropa û Emerikayê hejmarake zêde ye. Lî Emerikayê lî dora %50 kes beşdarê hîlbijartîna dibe. Lî Swêdê dî wexta propaganda hîlbijartîna gîştî de, gelek rêxistinên biyani, seri lî partiyên siyasî dîkîn, ku nûnerên wan partiyên bînan dî derxeqên politika partiyên xwe de nûnerên wan rêxistinan

agahdar bîkîn. Lî ser daxwaza komele û federasyonên biyani, partiyên siyasî, lî gelek tax û bajarên jî bo biyaniyan civin û seminer pêk tînin.

Dî 21 ê meha Tebaxê de Federasyona me jî, civîneke lî ser hîlbijartîna gîştî organize kir. Pênc partiyên ku dî parlamentoya Swêdê de tenê ten silkîrînan hatîbûn vewendî. Dî civîna de nûnerên her pênc partiyên siyasî beşdar bûn. Dî navbera -150 kesî civîna temaşê kirin. Lî gor rêza ku parti yênan siyasî rûniştîbûn, civîna destpêkê û hate domandin.

NÛNERÊN PARTIYÊN SIYASÎ Û AXAFTINÊN WAN

PARTIYA MERKEZÎ (Laila Vesonen):

Spas jî bo ku we me vewend vê civîna ha. Ez dî partiyê de weki sekretera biyaniyan kar û xebat dîkîm. Ez dixwazim piçek çala Partiya Merkezi bîkîm.

Swêd, berî 100 salî, gelek fekir û lî paşma bû. Pîraniya swedîyan lî gundan dijîyan Gundi nê sermiyandar û nê jî karker bûn. Wana bes dî axa xwe de kardîkîrîm. Dî vê rewşa dîroki û civatî de mûmesilê gundi-

yan, yê siyasi tûne bûn. Ji ber vê yekê partiya me, bî navê Yekitiya Gundiyân' dî 1910 pêkhat. Dî pêşketina civatê de û peşvêçûna sinayî, hejmara gundiyan kêm bû û karker û mamur zêde bûn. Ji bo em bîkaribana bersiva vê rewşa nû bîdîn, navê partiye dî 1960 i de bû 'Partiya Merkezi', iro dî nav me de gundi, karker û mamûr hene, mirovên normal û xwediyê sermayeki hindik ji dinav me de hene. Partiya me pişgirtiya biyaniyan dike û daxwazdike ku bê kari rake û biyani û Swedi bîbin wekhev. Vezirê biyaniyan Karin derson (1979- 1982) alikariya gelek cûrbe-cûr kir. Ji bo ku zarûk û ciwanên biyaniyan karibin bî zimanê xwe bixînin, Karin, tekoşineke mezîn da. Ev problem ji bo partiyan gelek girîng.

Lî ser rûyê cihanê iro aştî çîhakî girîng dîgre. Xeta partiya me dî siyaseta derve de, bê taraf e; em lî ser şopa koma milleta dîmesîn û pişgirtiya xebata ji bo heq û hukûkên mirovan dîkîn. Em, pişgirtiya gelê Kurd dîkîn.

PARTIYA ÇEPÊN KOMİNİST (OSWALD SUDEROWİST) ' Ez parlamenterê **PARTIYA ÇEPÊN KOMİNİST SUDEROWİST**: Ez parlamentere partiye yê Uppsalayê me. Bî siyaseta derve ve xebtîm û gelê Kurd baş nasdîkîm. Partiya me, partiye ki kevnare ye. Em dî sala 1917 an de ji partiya sosyaldemokrat çetiyân û me partîki nû pêkani. Armanca me avakirina sosyalizmê bûn. Me dixwest û dixwaz in ku hebûnên civatê, maden, bonç, şirket, bî kurtî hemû dewlemendiyên civatê bî plan û program bin dî bin kontrola civatî de be. Me lî dij çînen sermiyandaran heta nûha şerkriye. Lê belê partiya sosyaldemokrat heta nûha bî sermiyandara re kdr û barkriye. Û hin ji kar û barên wan bî sermiyandara re ye, ew reformistîm. Ferqa me û wan ya bîngihin, eve partiya çep hergav ji bo wekhevi, aştî û adaletê şerkriye. Em hergav bîne hevalê karker û belagazan. Em lî dij zordestiyê ne. Armanca me ew e ku her merov baribe jyaneki bî rûmet bî.

Alikariya gelê bîndest û xebatî navnetewî ji bo partiya me gelek girîng e. Gelek hevalên partiya me pişgirtiya gelên Afrika, Amerika Latin, rojhilata navim û bî taybetî ji pişgirtiya gelê Kurd dîkîn. Berî 15 salan dî derheqê gelê Kurd de, Swedi gelek tîşt nîzabûn. Em nîzabûn ku Kurd lî çawa dijîn. Lê, iro gelek Swedi kurdan baş nasdîkîn. Perçebûna Kurdan iro gelek mezîn e. Me dî sala 1978 an de doza kurdan anî. Parlamen toya Swedê. Armanca me, lî koma milleta munakaşakirina mesela Kurd bûn. Lê mixabî partiye dî pişgirtiya me nekîm. Partiya me heta niha gelek caran doza Kurdan a lî Iranê, Iraqê, Turkiyê û lî Suriyê, lî parlamana Swedê munakeşekîm. Le em çawa bîkîn, swed, ticaretê bî Iraqê û Irane re dike. Mal difroşe Turkiyê. Serekvezirê me Olof Palme dî navbêna Iraqê û

Iranê de diçe û tê. Koma Milleta ev vezife dayê wi. Ji ber van sedeman heta nûha, hukumet û dewleta Swed ewê xwe nezîki mesela Kurdan bîke. Lê, belê em dê xebata xwe bîdomînî. Kuştina Kurdeki lî Uppsala û xebata PKK lî Swedê rewş hineki quherand. Polisê Swedê (SÄPO) bî metodên gelek xirab kardike. Nakokiya navbena Kurdan ji bo xebata pêş rewşeke gelek xirabe.

PARTIYA GEL (STIG SVARD): Ez dî komita karker ya raxistina dibistanan de kardîkîm. Partiya gel lî hember cihana ku Oswald dixwaze, tekoşîn dide. Em partiye ki Liberalin û azadiya aborî û heq û huqûqên mirovan diparêzin. Bavariya me bî azadi û adaletê heye. Azadi bes ne ji bo Swediyan, lê belê lî welatî dî ji azadi pêwîst e. Swed, divê alikariya tevgera dîne bike û ji ber vê yekê ji, em hersal dî %1 hatna swedê dîdîn gelê belagaz û paştamayi. Partiya me dixwazê vê alikariyê zêde bike û derxe %2 ji ber ku jiyana aborî lî welatî dî, tesirê lî aboriya Swedê ji dike.

Partiya gel bî awayeki dostane lî gelşên biyaniyan dîne. Ji berê ve biyani jîna Swedê de roleki baş listine. Em karîm çer Stockholme minak bîdîn. Mimarkî itali proje wê çêkir û avakir. dî jiyana Swedê ya aboride ji, biyani roleke mezîn listine. Swed, welateki dewlemend e. Ji 20 salan vîde, gelek biyani hatin Swedê. Em, dikarin siyaseta swedê lî ser biyaniyan dî sê (3) nuxtande kombîkîn; Wekhevi, azadiya hîlbijartinê û bî hevra karkîm. Biyani û Swedi pêwîst e wekhev bin û xwedî imkan bin; karibin zimanê xwe yê zîkmaki pêşvebîm. Armanca civata Swedi ew e, ku Swedi û biyani bî hev re karbîkîn. Partiya me xebatîr ku zaroke kurda bî zîmanê xwe bîxwînin û ji ber vê yekê ji em lî dij balyozxana Tirkî rawestan. Her netew xwediyê azadi, maf û huqûqe evtîşt heqê kurdan e ji, dewleta Tirk vê heqîqate qet nîkari bîguhurine û ji navê rake.

PARTIYA KONSERVATÎF (INGEMAR LORD) : Ez, bî eslê xwe ji Estlandê me û ji welata xwe berî 40 salî derketîm. Ez ji weke we mahcîm. Partiya me gelek xebat ji bo biyaniyan kirîye. Berî çend salan lî Swedê merov lî ser biyaniyan gelek tîşt nîzabû. Partiyân hergav lî ser problemên zîman xebatîr. Dî parlamentoya Swedê de cara yekemî partiya me doza zîman anî holê. Merovê ku zîmanê xwe ji bîra bike ne meroveki temame. Em biyani divê zîmanê xwe baş ferbîbin û herweha Swedi ji ferbîbin. Em, divê Swedi ferbîbin, da ku em karibin, damîstandî bî Swediyan re dayîm. Em, divê kultur û adetên Swedi ji ferbîbin. Dî ferbûna zîman de giraniya mezîn dikeve ser malbat û dibistanan.

PARTIYA SOSYAL DEMOKRAT (BENGT OLOF TANGMARK) : Partiya sosyaldemokrat dî daviya qîrnê 1800 de avabû. Em partiya herî mezîn in û di-

tinên me yê internasyonal hene. Em endamê sosyalist enternesyonal in. Û partiye nezîki me lî hemû derê cihanê hene. Ev 53 salî, ku em lî Swedê lî ser hukum in. Bes şeş (6) salan em ne dî hukum de bûn (1976-1982). Me Swedê awakîr. Em ji hela siyasi de bî partiye dî re ji xebitîn. Pirê caran piraniya parlamento dî destên me dabû. Em dikarin bêjin, ku em baş bîserketîm. Swed bî dibistan, nêxweşxane û peşvêçûna xwe ve bînav û deng e.

Biyani dikarin dî hîlbijartina belediyan û welayetê de başdar bîbin. Em, niha ji xebatî dîkîn ku biyani dî parlamento de ji karibin deng bîdîn. Partiyên burjuvazî dî vî wari de lî dij me xebatî dîkîn. Em û partiya çep dî vî mesele dê wekhev difîkîrîn. Munakeşekîna dengdanê dî parlamento de kare lî Swedê tevgera nijatperestî xurt bike. Ji ber vê yekê ji, em divê bî awakî hosta bîçîn ser vî meselê, wezîra biyaniya Anita Gradin lî ser vî yekê kar û bar dike.

Dî pey axaftina nûnerên partiyan de temaşevanan, ji nûnerên partiyan pîrsên cûrbe-cûr kîm û bersivên wan hatin dayîn. Ez karîm ji wan pîrs û bersivên wan çend minak bîdîn:

PIRS: Dî van rojên dawî de hineki rojnameyên swedi lî dij doza kurdan a netewî nîvisar çap dîkîn û dîwşînin. Ew rojname û rojnamevanên wan rojnameyan dixwazî kurdan terorist şan bîdîn. Ev kampanyaya ha ya dij kurdan hin ji pêşve bîrîn û nîvisandî " kurdên terorist dê Olof Palme bujîm " Ew rojname, rojnamevan û polisê SÄPO (MÎT'a Swedê) bî zanatî lî dij kurdan propagandake dijwar û pîr alî vekîrîne. Bî awakî vekîrî danûstandîna wan bî balyozxana Tirkî ve heye. Hun partiye siyasi dî vî wari de bîdeng dimînin. Gelo hun dî vî babetê de çî difîkîrîn?

Bersiva nûnerên hemû partiyan kêm û zêde nêzi hev bûn. Bî rêz re û bî kurtayî wiha bersiv dan:

BERSIV: Lî Swedê azadiya rojnameyan û rojnamevanan hene. Lê, na ye wê manê ku rojname û rojnamevan tîştên bê bîngehî û derew bînivîsin. Bî azadiyê re berpîrsiyarî ji divê hebe. Em ji wan nîvisarên wîlo ne ecibîn. Û lî dij tewrên wiha derdîkevin. Lî Ewropa bî taybetî lî Swedê hevdu kuştîna kurdan ji wan kesan re rê vedîke. Em ji baş dîzanîm, ku piraniya kurdan bî xwe lî dij wan bûyerên kuştînê ne.

Temaşevanan, çend pîrsên dî ji dî derheqê doza kurdan a netewî û tengezare nûnerên partiyan, iro zîlm û zora ku lî ser neteweyê kurd heye qebûl kîm û pişgirtiya partiye xwe ji netewê kurd re dan diyarkîm.

LI SWÊDÊ

ENCAMA HILBIJARTINA GIŞTÎ

E. COTKAR

Dî roja 15 ê Îlonê 1985 an de, lî Swêdê, jî bo parlamentoyê, belediyan û meclisên wilayetan hilbijartina giştî pêk hat.

Dî vê hilbijartina giştîya 15 ê Îlonê de, partiyên Swêdê, bûn du bend û du ali. Bî taybetî partiyên ku parlamenterên wan dî parlamentoyê de hebûn refên xwe baş zela û cûda kirin. Dî ref û benda Çep de partiya Sosyal Demokrat û partiya Komunist (VPK) û dî ref û benda Rast de jî, Partiya Moderat (Partiya Konservativ), partiya Merkezi (Partiya Center), Partiya Gel û ya Hristiyanan ciyê xwe girtin û beşdarê hilbijartina giştî bûn.

Jî derê van partiyê ku berê parlamenterên wan dî parlamentoyê de hebûn, çend partiyên din jî beşdarê hilbijartina giştî bûn. Û disan wek berê ew partiyên biçûk derê parlamentoyê man. Jî van partiyên biçûk hnekan, lî gor politika xwe û jî ref û benda Rast û Çep yekê hilbijartin û dengên xwe dane wan. Jî wan hnek bî xwe jî, bî serên xwe ketin hilbijartina giştî û disan encameke baş ne girtin û ne ketin parlamentoyê. Lê dî meclisên belediyan û Wilayetan de ci girtin.

Lî gor hilbijartinên berê, dî bend û refa Çep û Rast de guhartîneke mezî û grîng çêbû. Lê dî nav refa Rast de deng hatin guhartin. Dî nav Refa rast de darba mezî lî partiya Merkezi û lî ya Konservativ (Modarat) ket. Partiya merkezi jî 56 parlamenterên xwe, 12 parlamenter wînda kir. Partiya Modarat jî, jî 86 parlamenterên xwe 10 parlamenter kêr kir. Dî hilbijartina 15 ê Îlonê de Partiya Sosyal Demokrat 7 û Partiya Çep yê Komunist jî parlamenterek wînda kir.

Partiyên burjuvazi, jî bo propaganda hilbijartinê gelek pere rijandin û hemû imkanên xwe bî kar anin. Wan xwe bî koalîsyon dî iktiradê de diditin. Guhartina sistema Swêdê jî xwe re kirî bûn armanc û progam û dabûn pêşiya xwe. Lê, bî alikari û piştgiriya partiyên çep yê biçûk û ya VPK, Sosyal demokrat bî ferqeke biçûk disa hatin iqtidarê.

Jî partiyên rast partiya Modarat û ya Merkezi, dî vê hilbijartina giştîya ha de gelek hilbijartvan wînda kirin. Sedem ev bûn ku ev her du partiyên burjuvazi dî propaganda xwe ya beriya hilbijartinê de politikeke hîşk û konservativ dabû pêşiya xwe û ajotin. Bî taybetî Partiya Modarat, dî politika Swêdê ya der û hundir de gelek vekirî mafên monopolan parast û piştgiriya dewletên nijadperest û diktator kir.

Dî refa partiyên burjuvazi de, Partiya gel (Folk Parti), bî taybetî serokê partiyê Bengt Westberg, vê rewşa ha baş dit û lî gor rewşê politika xwe meşand. Dengên hilbijartvanên partiyên burjuvazi girt. Partiya Gel, bî rasti dî politika xwe ya bîngehin de, jî wan her du partiyên rast (Modarat û Merkezi) cûda na fikire. Dî nav hilbijartvanên swêdi de, dîlsarbûn û dîlnexweşiyek heye. Serokê Partiya gel, lî gor Psikolojîya swêdiyan, bî zumaneki nerm dengên hilbijartvanan berhev kir. Mîrov çaxa bî çaveki lêkolîni û hêjani lî hilbijartinên Swêdê binêre, dî nav partiyên burjuvazi de dem dem kêmbûn û zêde-

bûna dangan dibine. Dî hilbijartîneke giştî de dengê hnek partiyên zêde dibe, hnekiyan kêr dibe û jî partiyek dîçe partiya din. Dî bîngehê xwe de guhartîneke grîng nin e. Deng dî nav partiyên burjuvazi de digerin, guhartin hemû ev e.

Lî Swêdê dî careki de sê (3) cûrên hilbijartinê bî hev re pêktê. Ev her sê cûrên hilbijartinê; jî bo parlamentoyê, meclisên wilayetan û jî bo belediyan çêdibin. Lî gor qanûnen Swêdê, biyani jî beşdarê hilbijartinê dibin. Lê çawan? Biyanîyên ku jî sê salan zêdetir lî Swêdê dijîn û mafên wan yê rûniştin û xebatê hene karin, bî tenê beşdarê hilbijartina meclisên belediyan û yê wilayetan bîbin. Jî biyaniyan re, jî bo dengdana wan û parlamentoyê, pêwîst e, ew kesên biyani hemwelatîyên Swêdê bin. Ev yek jî bo kesên biyani merceki grîng e.

Kesên biyaniyên ku lî Swêdê dijîn, lî gor qanûnên Swêdê mafên wan yê du hemwelatî nin e. Ew kesên biyaniyên ku bixwazin bîbin, hemwelatîyên Swêdê, pêwîst e, ku jî hemwelatîya welatê xwe derkeve û bibe hemhelatîyê Swêdê. Ew çax kare jî bo hilbijartina parlamentoyê jî deng bide. Yani hemwelatîya Swêdê pêwîst e. Lî ser vê rewşa ha, lî Swêdê gelek lêkolîn hatin çêkirin û tîn. Dî vê babetê de lî parlamentoyê û lî derê parlamentoyê gelek raberin hatin kirin û tîn. Îro, partiyên siyasî jî, jî vê problemê re çareser kirin digerin. Ditînen cûda cûda hene. Komunist û jî Partiya Sosyal Demokrat hnek, jî bo dengdana biyaniyan ya parlamentoyê dixwazin piçek qanûnê nerm bikin. Lê, partiyên burjuvazi lî dij derdikevin û mercên hemwelatîyê diparêzin.

Lî gor hilbijartina giştî ya 15 ê Îlonê encama deng û parlamenteran wîha bûn:

NAVÊ PARTIYÊ	JÎ SEDI	HEJMARA PARLAMENTERAN
MODARAT	% 21,3	76
GEL	% 14,3	51
MERKEZ	% 12,5	44
S.DEMOKRAT	% 45,0	159
VPK (komunist)	% 5,4	19


ENIYA RAST: 171 Parlamenter

ENIYA ÇEP: 178 "

Lî gor vê tabloya ha, bî alikari û piştgiriya VPK, dê partiya Sosyal Demokrat disa hukmateke nû avabike. An jî kare ya kevn bide domandin.

BETAL EZİZ

LI AFRİKA BAŞÛR ÇI DIQEWIME



Nûçeyên ku dî van rojan de ji AFRİKA BAŞÛR tên, programa radyo û pelên rojnaman dagirt. Ev bûyerên dawî, bala tewaya dînê kışand ser xwe. Îro li AFRİKAYA BAŞÛR zîlm û zordari rojên xwe yê dawî diji; ji ber vê yekê ji hukmeta nijadperest howitiya xwe dijar kir. Lê rejima nijadperest ji baş dîzane ku her laşek mirî û her dilopek xwin, daviya wê nêzîktir dîke. Muhalefet a reşikan dî bin rewşa awerte de, li ser kuştin û xwin gaw bî gaw ber bî armanca xwe dimeşe. Çawa ku çend sal berî nuha, Reşikên MOZANBİK, ANGOLA û RODEZİYA xwinmijan ji ser damarên xwe durxistin, reşikên AFRİKA BAŞÛR jidê xwinmijan ji ser serê xwe bixinin û bî xwe bîbin efendiyê welatê xwe.

Tarixa zulm û zordariya spi ya, 300 sal berî nuha destpê dîke. 300 sal berê, waxta muhacirên HOLLANDÎ çûn AFRİKA YA BAŞÛR dewlemendiya wêderê bala wan kışand. Li AFRİKA BAŞÛR her tişt hebû; Ax, zêr, maden û kedên mirovênreşik. Mirovên spi bî zora çekan wêderê xistin bin nîrê xwe. Edî ax, zêr û kedên mirovên reşik yê wan bûn. Ji reşika re tenê neçari û xebata 1000 metro binê erdê, xwin û mirin ma bû. Mirovên spi wan maden û zeran tev bî destên mirovên reşik 1000 metre ji binê erdê dan derxistin. Bî kar anin û saltanata iroyî saz kirin. Ew saltanata mirovên spi heta îro meşiya û hat. Îro ji disa rejima nijadperest bî alikariya dewletên imperyalist û bî alikariya dewletên kevnepereşt dîxwaze vê zîlm û zordariya xwe bimeşîne. Ji bo vê yekê ji her xwestinek bî çûk re bî xwin û kuştin bersiv dîde.

Dî sala 1948 an de wextaku PARTIYA NASYONALİSTA NÛ hukum girt destê xwe, qanûn û nizamnan ji bîni ve guherand. Ji ber ku wan çaxan serok û endamê wê partiye dî bin tesira idolojîya faşist de ma bûn û terafdarê Hitler bû. Dî helbijartinê de ji reşikan re heqê ray nedan. Zewac nav reşik û spiyan qedexekirin. Qanûna pa-

saportê derxistin, ku li gor wê qanûnê re şikeki nîkaribû ji bajereki biçe bajereki dîn. Herem û taxa reşikan ji yê xwe ve-

qetandin. Bî kurtayi nijadperesti bû wek ideolojîya dewletê.

Bê şik e, ku dimeşandina wê siyaseta nijadperesti de spiyên AFRİKA YA BAŞÛR ne tenê bî serê xwe bûn ji despêkê ji xwe re hineka hevalbend girtî bûn. L AFRİKAYA BAŞÛR wan heyinên bînerd û sererdê hewqas zêde bû, ku him ji spiyên AFRİKA BAŞÛR re, him ji ji imperyalistan re têr dîkr.

Ji ber viya ji, rejima nijadperest rabû wê dewlemendi yê pêşkeşi dewletên imperyalist kir. Ew dewletên imperyalist û dewletên kevnepereşt ji hemberê zor û zulmê bê deng man û dî ser de ji, ji rejima nijadperest re alikari dan. Wîlo ne bûya Ew 4,5 milyon spi nîkaribûn 20 milyon reşik dî bin hukmê xwe de bigirin. Yek ji, komara AFRİKA BAŞÛR zîlm û zordariya xwe ne tenê li ser reşikên AFRİKAYA BAŞÛR dimeşîne, rejima nijadperest çavsori li ser ciranên xwe ji dîke. Ji xwe BOSTWANA û LESOTHO dî bin nîrê wê dane. Li ser NAMİBYA jîhîkmê xwe li gor dilê xwe dimeşîne. Hewqas xwin çavê rejima nijadperest têr nake, icar êrişan dîde ser MOZANBİK û ANGOLA. Ji ma nijadperest, bî akilmendiya Amerika yekbûyi li Afrika ji xwe ra dostê nû ji çekriye, çend parti û organizasyonên kevnepereşt yê reşik wek (UNITA-FNLA). Îro Amerikayê yekbûyi û rejima nijadperest li hember reşikên neçar şer dîkin. Îro, Botha serokîya ve rejima nijadperest û kûçikiya Emerika dîke.

BOTHA KİYE ? Botha serokê kome- ra AFRİKA BAŞÛR e. xwe ji nijad-


peresteki gewre û heyranê Hitlere û disa serokê partiya nasyonala nû ye. Bê şik li ser siyaseta dewletê tesira wi mezî e. Lê îro AFRİKA BAŞÛR siyaseta bî tenê dî destê Botha de ye, siyaseta wek her dewletê kapitalist dî bin tesira monopolên kapitalist de ye.

AFRİKA BAŞÛR bûye welatê biyani. Îro, li Afrika Başûr 400 monopolên Amerikaya Yekbûyi hewqas ji monopolên İngilîz kar dîkin. Almanya Rojawa ji bî 283 monopolên xwe ve li dû karwanan cih girtiye. İSRAİL, FRANSA: DANİMARKA û SWÊD ji xwedi monopol in (swed ji bisê monopolên xwe yê mezî xwina reşikan neçar dîmîjin ATLAS COPO-FAGERSTA-SANDVİK.) Çi acêbê ku sendika karkeran LO ji şirike şirketa sandvike. Lê belê LO dî 20.8.1985 de para xwe ya şirketê derxist fîrotanê ji wan ji meriv dîkare, bejê ku Bothayê faşist û partiya wi dî bin xizmeta imperyalizma dînê de ne. Ji ber vê yekê ji, dî derxistina her qanûna nû de, dî her katliam û dilope xwin de mesuliyeta wan dewletan giran e.

Li hember wan zîlm û xwinmijê, mirovên reşik tû cari bê deng neman. Dî her firsenti de tekoşin dan û dengê xwe bilind kirin. Her serhildan dî nav xwin de ma; lê disa ji seri netewandin. Çi wext ku reşik dengê xwe bilind kirin ew dewletên imperyalist û kevnepereşt yan skut man yan ji kritikeki (rexneki) piçûk şandin ji rejima nijadperest re û Ambargo danin. Lê disa alikariya xwe biveşarti domandin. Li ser hukumata nijadperest, ji 1960 şûn ve gelek caran ambargo hate danin, lê her car ji E. Yekbûyi, England û İsrail dijê wan ambargoyan derketin.

Dewletên Ewrûpayi ji, heta niha dî derheçê ambargoyê de tewreki du ali girtin. Ambargo gelek caran tenê li ser kaxizan ma; alikari û bazirgani disa dom kîr. Par hukumeta Danimarkê, bîrîyar girt û firotina petrolê qedexe kîr. Lê şirketên Danimarkî bî riya dîzi jî hukumeta nijadperest re li dor 30 milyon ton petrol firotin. Disa dî sala 1980 yî de Îngilistanê jî firotina çekan ambargo dani; lê çend şirket bî riya çaçaxî çekê xwe firotin. Bî rasti li ser siyaseta hukmata nijadperest, tesira Îsrail jî gelek giran û mezin e. Dostaniya Îsrail û Afrika Başûr jî mêj ve destpêkiriye. Meriv dikare bêje jî sazûna Dewleta Îsrail ve destpêkiriye û hetani iro jî dom dîke. Li dinê cara yekemin Dewleta Îsrail, jî aliyê komara Afrika Başûr ve hat naskirin. Ji wê rojê şûn ve jî, Îsrail, weke ku deynê xwe yê minetê bide çî alikari jî destê wê bê pêşkêş dîke. Afrika Başûr bî alikariya Îsrail, ordiya xwe modernize kîr. Îsrail jî wan re balafir, pilot û pîsporên leşkerî dîşîne. Afrika Başûr bî alikariya Îsrail, bombên atomî çêkîr û dîke. Dî sala 1979 an de her du dewlet bî hev re dî Okyanusa Hindi de bombên atomî ceribandin. Disan dî navbera van her du dewletan de bazirgani pîr pêşte çû. Û ev têkili hatiye merheleki wisa ku Komara Afrika Başûr hesin û malên xwe bî navê "madde in Îsrail" derdixê bazara dinê.

Dewletên impyeralist, rejima kevneperest û Botha yê faşist jî, dîzanan ku ev dewran û seltenat êdî zêde nameşe. Reşikên Afrika Başûr jî, dî bin zîlm û xizaniya 300 salan de hêdi hêdi radibin. Rêxistî û ordiyên xwe avadîkin. Îro, tekoşina reşikan, dî bin serokatiya ANC (Konferansa Netewî ya Afriki) de dom dîke. Lê, dî vi şeri de ANC, ne bî tenê bî serê xwe ye. Dî 1984 an de 600 organîzasyon ûgrûbên li dijî rejima nijadperest eniyêke avakirin (UDF). UDF êdî xewna Botha yê faşist dîrevine. Rejima kevneperest û dewletên impyeralist, dîxwazî bî reformê çavê muhalefetê girê bîdî, reşikan bîxapînin. Ji ber vê yekê jî, Amerika Yekbûyî û hinek dewletên Ewrûpayî dîxwazî dî nav hêzên muhalefetê de dêrê derxî pês û bî wê çavê reşikan girê bîdî. Ji xwe dî sala 1984 an de Komîta Aştiya Nobelê diyariya xwe ya aştiyê da DÏSMUND TÏTU. Dismund Titu, bî xwe jî reşik e û dî nav muhalefeta reşikan de nûnerê dêrê ye. Wî dî axaftina xwe ya li Swêdê hinek bî minet, bî lava û gazî jî Amerika Yekbûyî û jî dinê aşti xwest. Piştî axaftina wî, Reagan hineki nerm bû û rexne li rejima nijadperest girt. Lê rexna Reagan li ser kursiya axaftinê ma! Tişteki eşkere ku Komîta Aştiya Nobel bî zanyari diyari da D. Titu. Komîta Aştiya Nobel, dîxwest hinek kesan û rêxistnan derxe pêşiya tekoşîna reşikên neçar û reben. Komîte, dî sala 1983 an de jî diyariya



Nobel dabû Welasayê Poloni. Komîte çend sal berê diyariya aştiyê dabû Enwer Sedat û Begin jî... Li gor rojnama Verdens Gord (rojnama noryê) isal jî jî aliyê parlamentereki Îsrail û profesoreki universita Noryê ve Reagan jî bo diyariya Nobel berendam bê şandin. Lê li aliyê din haya Komîta aştiya Nobel, ya min û ya her kesî jî, jî NELSSON MANDELLA (sazker û serokê ANC) heye, ku ew 21 sal e, ku dî zindana rejima nijadperest de berxwe dîde û tekoşinê didomine. Wek tê biranin, par hukumeta nijadperest berdana wî, bî hinek mercan qebûl kîr, lê wî bî xwe wan mercan qebûl ne kîr. Ez dîxwazî nîvisara xwe bî bûyerek ve girê bîdîm. Dî sala 1984 an de li Afrika Başûr karberdaneke mezin pêk hat. Nêzi 800.000 karker 2 rojan we çûn kar û li mala xwe rûniştin. Dî dawiya wê karberdanê de hukumetê, serokên sendîcan

girtin û mehkeme kîr. Hinek jî wan berdan, lê disan jî rewşa hukumetê xîrab bû. Berpîrsiyarê hukumeta nijadperest, jî bo ku rewşê hinek nerm bike, çû bî serokê sendîcan re danûstandin dani û bî wan re munaqêşe kîr. Serokê sendîqê TAMÏL TAMÏ dî civinê de " ez berpîrsiyarê sendikayê me, ne berpîrsiyarê gel im. Heger hukumet dîxwaze bî gel re danûstandin dayne, fermo bila here zindana xwe, berpîrsiyarê gel li wêderê girti ye. Bila hukumet bî NELSSON MANDELLA re munaqêşe bike" digot.

Belê, diyar e, ku xwediyê aştiyê û serfiraziyê ne dêr e û ne jî Dismund Titu ye! Nijadperestên xwinrêj û xwinmêj na bin xwediyê aştiyê. Ew şerkerên rûreş in. Xwediyê aştiyê û rojên ronî û xweş reşikên bîndest in. Aşti û serfirazi ya wan e.

SAVAK

Û

ZINDANA EVINÊ



WERGER: RÊBER

Geli xwendevanan!

Mî nê nwisara ha, ji pirtûka "Şoreşa Îran û Bûyerên Pêş" girt û bî kurtahi ji zimanê erebi wergerand kurdî. Dî diroka gele Îranê de du tişt hene. ku qet ji bir nabin; yek SAVAK û ya din ji, zindana EVÎN e. Bî plan û alikariya Amerika Yekbûyi, dî dema Şah de SAVAK û EVÎN hatin avakirin. SAVAK ê bî hezaran peşverû û welatparêzên ecem, kurd, ezere û yê din, dî, zindana EVÎN de êşkence kir, kut-leng kir û kuşt. Piştî tekçûna rejîma Şah, SAVAK belav bû; Lê zindana EVÎN dî şûna xwe de ma. Îca PASDAR ket şûna SAVAKê, Zindana EVÎNê disa bî kesên peşverû û welatparêz tije bû. Tiştê ku hat guhartin, SAVAK çû, PASDAR hat. Îro ji bê hejmar kurdên welatparêz û welatevin dî zindana EVÎN de, dî bin gelek mercên gran de dil in. Niha dî zindana EVÎN de êşkence û lêdan ji dema Şah zedetir in. Ji ber vê yekê, ez dixwazim bî vê kurte wergera xwe zindana EVÎN piçekî bidimnasandin.

Savak, rêxistina tûjandina tanaya (parastina) hundirin bû. Rêxistina Savak, dî sala 19.08.1953 yan de bî destê CIA û plana Kérmî Rozfelt (konsolosê A. Yekbûyi li Îranê) li Îranê hat avakirin. — li dû inqilaba Mîstîk— Dî sala 1957 an de parlamentoya Îranê, ji bo karûbarên Savakê yê fermî biryar da. Dî wê demê de Ayahtullah Şeriad Mederi, endamê parlamentoya Îranê bû. Medari dibêje ku "wan ji me re digotin, dê ev rêxistim li dij komunist û ajanan bixebite. Lê bî dû re me dit, ku ew li dij netewe û welatê Îranê kar dike."

Berê CIA, SAVAKê avakir, lê pişt re MOSAD (istixberata Îsrail) ket nav xebata SAVAKê. Û her ku çû SAVAK, xurt û fireh bû. SAVAK, ji parlamentoyê heta wezaretan, malên parlamenter û weziran, çayxanan û gundan belav bû. Heta ku SAVAKê dî nav jinên xirab de ji, ji xwe re ajanan peyda kir. Ji leşkeran heta serleşkeran her kes ket bin kontrola SAVAKê. SAVAKê destê xwe ji aliyê din ve dirêji dadgeh, mamoste, imam û nav feqan ji kir. SAVAK, dî demeke pîr kurt de fireh bû; hejmara wê ya fermî gehişt 60 hezar kesi. Ji derên kesên fermî, bî qasî 2 milyon xwefros û muxbirên wê çêbûn. Terazûna SAVAKê ya sala 1953 an 600 hezar dolar bûn. Dî sala 1978 an de terazûna wê derket milyarek û 200 milyon dolar. Gelo çima ev terazûn hewças zêde dibû? Ji bo ku SAVAKê, dema dest bî xebatê kir; berrawestin

û berxwedana gelê Îranê yê li dij Şah, ji texmîna wan mezintir û firehtir bû. Ji aliyê din ve, ji bo xebata SAVAKê, ji Amerika Yekbûyi, Îsrail û Afrika Başûr gelek makîne û hacet hatin kirin. Sedemeki din ji, SAVAKê, çarçove û qada xebata xwe fireh kir û ra û çaxên xwe berda derveyê Îranê. Ew kesên Îrani yê ku li derê welat dîman û li dij Şah dixebitiyan, wan ji dîkîrin bin kontrola xwe. Sedemeki din ji, ji bo Rojhilata-Navin û netewên wê, Şah Îranê ji imperyalizmê re kirî bû qereqola pêşin. Li gor gotinên generalê SAVAKê Nasrî, dî tûjandina xwe de "SAVAK ji 9 beşan pêk hatî bû û serokê herî mezin Şah bî xwe bû. Her biryarên girtin û kuştinê, bî destê Wi bû. Prensîp û slogan her tişt ji bo jiyana Şah bû; mayîn û ne mayîna netewên Îranê qet ne girîng bû."

Dî vi wari de em karin du minakên biçûk bidin:

Jinek dî mehkema general Muhtemedî de (dema ku Şah ji karîne ket û Xumeynî hat ser karîne, generalê SAVAKê Muhtemedî dil girtin û wi anin mehkemê) beşdar bû. Berî ku mahkeme biryara bî dardakirina general Muhtemedî bide, jinekê ji general Muhtemedî pirsî:

— Mî na bêjim, ew her çar zarokên mî yê ku te bî darê zorê ji ber çaven mî bir, tu li mî vegerîni; mî divê tu ji mî re bêji, ka goristanên wan li ku ne? Lawîkê mî yê mezin 12 salî û yê biçûk 5 salî bû. Muhtemedî serê xwe

kir ber xwe û bersiv ne da.

Jimeke din ji, dî eynî mehkemê de pirsî:

— Ez, ji te na pîrsim, çima te zarokê mî yê 2 salî li ber çavên mî kuşt; ji mî re bêje, ka mî û birayên mî?

Wê demê hakim ji generalê SAVAKê pirsî:

— Ji bo çî te zarokê 2 salî kuşt?
— Mî ew zarok ne kuşt.... wi bî xwe, xwe da ber fişekên debanca mî!...

Hakim:

— Te çend fişek berdî wi?
— Heft (7) !? ...

Bî hezaran bûyerên wîha li Îranê bûn. Malên Îraniyan ne ma, ku SAVAKê çû ziyaretiya wan (kuştina wan-R) û malên Îraniyan ne man, ku kes ji wan ne ket zindana SAVAKê ya bî nav û deng, Zindana EVÎNê!

ZINDANA EVINÊ

Ji avakirina ZINDANA EVÎNê, heta dema Îmam Xumeynî, bî hezaran kes ketin Zindana Evinê û derketin; lê, kesi nî zanî bû, zindan çawa ye û çî ye. Ne ji keseki karî bû wê wê bide. Ji ber ku yê ku sax dîman û ji zindanê derdiketin, çavên wan grêdayî bûn. Dî hundirê zindanê de ji, girtîyan, ji diwarê reş pê ve tiştêki ne didîtin. Dema ku rejîma Şah têkçû, xelkê avêt ser zindana Evinê û deriyan vekirin. Girtîyan berdî. Ew çax zindana Evinê hat eşkera kirin û nas kirin.

Zindana Evinê 7 çat e. Sê (3) çat lî ser rûyê erdê ne. Çar (4) çat jî dî bin erdê dane. Jî bo ketin û derketinê, bî tenê deriyekî zindanê heye. Mezin î firehiya zindanê têri çend hezar kesan heye. Ew kesên ku lî dij rejîma Şah bûn, dî çatên bin erdê de bûn. Dergehê zindanê bî şifre û elektron e. Hucreyên zindanê cûrbe-cûrin. Hinek jî bo yek kes, hinek jî bo du kesan û hinek jî, jî bo 50 kesan in. Himê zindanê bî xwe hemû bombakirîye. Hemû rê û koridorên Zindana Evinê, dî bin çavdêriya kamerên televizyonê de ne. Riya bin erdê cot (çift) e. Kamyon têde tîn û diçin. Dirêjiya wê bî kilometran e. Jî wan rîyan yek, zindanê bî qesra YAF-RAN ê (mala Şah) ve grê dîde. Û ya dî dîçe merkeza SAVAK ê.

Şah, nivê wexta xwe lî Zindana Evinê derbaz dîkir. Qata yekem jî bo Şah û generalên wi hatî bû çêkîrîn. Dema tûjandinê kesên mezin, Şah bî xwe, dî tûjandinê de beşdar dibû. Wi, bî xwe fermanê kuştin û bî dardakirina wan kesan didan. Êşkencên mezin û giring lî ber çavên wi dahatî kîrîn. Êşkence bî metodên cûrbe-cûr dibû. Her metodeke êşkencê, navek lê kirî bû. Wek Peyayê Goril, Riya Apollo, Mafên Pirekan Yê Mehê, Xwarîna Berbangê, Bayê Germ û Sar, Dumana Eksosan, Hîlkîrîna Neynûgan, Şikestîna Hestiyên Piştê, Çavderxistin û hyw...

Kesên ku dîketî zindanê, 'Peyayê Cehennemê Cihangîrî Tarûk' nas dîkîrîn. Ew serokê grûba êşkence bû. Dî nav girtîyan de navê wi, "Gorilê tîrs û lîrz" bû. Dî nav xelkê de bî dest dirêjiya jîmên zindanê, dîhat nas kîrîn. Wi, lî ba bav, bîra û mêran tecawîzê jîm û keçan dîkir. Dema kêf dîkir û serxweş dibû, bî banga beyanî re dîhatî zindanê û jî girtîyan dîpîrsî:

— Hun çavan in? Rewşa we çawa ye?

Heger girtîyan bigotan "em baş in" Dîgot" madem ku hun baş in ka ez we pis bîkîm" û dest bî êşkence dîkir. Heger girtîyan bigotan "rewşa me ne baş e," wi dîgot, "ka ez rewşa we hin ne baştir bîkîm." Girtîyan dîgirtî û dîbîrîm êşkencê.....

Aletekê êşkencê jî Amerika Yekbûyî anîbû û navê wê danîbû APOLLO. Girtî, lî ser kursiya elektrîkê rûdîniştandin û kumekê wek ya Apollo didan serê wi. Lembeyên elektrîkê yê germ û ronî didan ser çavên girtî û pê re pê re dest bî pîrsan dîkîrîn. Dema ku şîka wan jî gotînen girtî çêdîbû, jî her alî ve elektrîk didan laşê wi.

Jî bîl van metodên êşkencan, kuştin, xenqandin û karanîna dermanê "SÍ-YANÛR" (hebên jehrê) tîştên normal bûn.



YILMAZ DI NAV ME DE YE

NIVISKAR, LEYSTIKVAN, FÍLIMÇÊKER Û TEKOSERÊ KURD YILMAZ GÜNEY, DI 9 Ê MEHA ÎLONÊ 1984 AN DE LI BAJARÊ PARÎSÊ ÇAVÊN XWE GIRTIBÛ Û JI CÎHANÊ BARKIRIBÛ.

ISAL, LI GELEK WELATÊN EWRUPAYÊ, YILMAZ GÜNEY, DI SALVEGERA MIRINA XWE DE HAT BI BIRANIN. LI SWÊDÊ JI, FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ, DI ROJA 06. 10. 1985 AN DE LI BAJARÊ STOCKHOLMÊ SALVEGERA MIRINA YILMAZ GÜNEY, BI ŞEVEKE GIRSÎ BI BIRANÎ. EM DE DI HEJMARA BERBANGÊ YA 6/85 AN DE DI DERHEQÊ VÊ CIVÎNA HA DE AGAHDARIYEKE FIREH Û DIREJ BIDIN!

BAVÊ NAZÊ

Di mezelê 'Par la Chaise' li Parisê tîrbek mîna hemû tîrbên, bî navê kesê ku têde veşartîye cîyê xwe girtîye...

Lî ser kevîrê şehkîrî data buyî û çûna wî jî dinê jî hatiye nivîsandin. Gîha jî lî dorê dest bî şînkayê kirîye, tevî ku salek lî ser tîrbê neçûye... Gulên sor dî navbera demekê û demekê lî ser tîrbê nuh dibîn. Çilmisandin jî wan re tûne ye. Çawa jî mirin tûneye jî nav û karê xwediyê gorê ne...

Erê Yilmaz ev bûye salek, ku deng jî te bilyaye, lê navê te karên te yê hunerî lî nav millet digerin. Û hîn jî xelkên me digrîn. Û hisiran dibarînin bî hêsrên lehengên film û romanên te. Lomajî tim û tim lî ser te diponîjî û dilê wan tê givaştin lî ser çûna te...

Yilmaz ez zanîm, ku tî rehetîya xwe dî tîrbê de nabî, weko tî rehetiyê canê xwe ne didî lî jîyanê.. Ma tê çawa cîyê xwe xweş bikî, gava hîn zarokên me lî ber nigên dujîmî dirî? Erê ma tê çilo kêfxweşbî madam hîn postalên leşkerên neyaran lî ser sînga gelê te ye!

Jî bo wîlo dibe piştî çûna xwe tu dixwazî nasbîkî çî heye lî dinê? Berî hertiştî lî ser te dixwazîm bîpeyivim: Dîjîmî û neyar hîn bêtir şerê te dîkin û bêbextiyê bî te re dîkin. Lê milletê me te jî bîr nake û tim û tim tû dilê wî deyê... Tevî, ku navê te ne navekî kurdiye, bî sedan navê te lî zarokên xwe kirine. Lê mixabî jî kê mî paşmêriyê navê te lî sikakên bajarên Kurdistanê ne kirine. Tîmsalê te jî lî garsînen paşmêriyê wêlî te ne hatiye danînin. Ne xelata Lînin û ne ya Nobîlî bî te venekirine. Na ez şaş ne bûme û devê min ne şeetîye, lewra dibe merov piştî mirina xwe jî van

mîdalan distîne.

Yilmaz, lî gora ku min bîhîstîbû tî çû û hêviya nivîsandina destanekê lî ser kurdan te bî xwe re bir gorê.. Kurê Kurdistanê hêja ez zanîm ne tenê te ev hêvi bî xwe re biryî gorê.. Lê emê çîbkin bextê me kurda reşe, qey xwedê wiha kirîye, ku emê tim û tim lî ber deryan bin û çavên me lî destê xelkê be!

Yilmaz, ez zanîm ku tu dixwazî nasbîkî çî lî Kurdistanê niha çêdibe Ruhniya çavên me hîn welatê te bîndest û çar perçe ye. Û hêzên ku xebatê dîkin jî bo rizgariya welatê şerê hev dîkin. Yilmaz helbet bî van gotînan tu dîeşî, lê çawa bikîm, divê ez rastiyê jî te re bîbêjim, tevî ku ew tal e.

Kurê Kurdistanê, dibe te bîhîstîbû ku lî welatekî gava bera nişfekî jî çûkan jî hêlîn û lûsên wan dan, çûk derneketin. Jî bo wîlo pîr jî wan hatî kuştin. Û yê sax man dîlî qebûnekîrîn bî xwe jî xwe guştin. Erê xwe kuştin çîmkî ne xwestin navê muhacirtiyê bînin ser xwe. Jî mîj we perîkên wan bûye belge jî neyarên wan re, û jî zûde hêk û çêlikên wan hatînin pelçiqandin. Lê gîyanê wan bî rumet û serfîrazî dîfire lî ser çîya û newalan û ban dîkin: Hestiyên xwe.. bî hev din, emê vejenin...

Erê emê vejenin û jî nuv re emê hêlinên xwe deynin lî lûsên bav û kalan..

Yilmaz, lê mixabî sînorê welatê me lî paş me maye û me lûsên xwe lî ewripa çêkirîye. Hêkên me jî dî hêlinan de bûne çêlik.. Rewşa me eve heger kesên ku dî zindanan de û şepalên lî serê çîyan destana millet berdewam nekîrîna û rumeta me neparastîna gerek kurd jî mîna wan çûkan xwe bîkuştan..



Beşikçi dî zindanê de ji dînwisine

DIVÊ KURD

Î. BEŞİKÇİ JI BİR NE KIN

XWENDEVANEK

Yê ku navê İsmail Beşikçiyê zana, jîr, mêrxas û rastgoti ne bihistiye nin e. Beşikçi, sosyolog e. Xebata wi, li ser komara Tirkîyê û politika wê ye. Xebata Beşikçi, bî taybeti li ser politika dewleta tirk a dî derheqê kurdan de ye.

İsmail Beşikçi, şoreşgereki xas e. Heta iro dî ditinên xwe de tu car paşve gav ne avêt û rêça xwe şaş ne kir. Jî ber vê yekê jî ew gelek tada û neheqî dibine.

Loma dewleta kolonyalist bî salan e, ku Beşikçi dî zindanên xwe de pûç kir. Wi zindan bî zindan dîgerine. Dewleta tirk, jî bo ku Beşikçi jî birûbaweriyên wi

poşman bîke her metodi bî kar ani. Lê bê fayde bû, Beşikçi bî qerara bû. Qet tawiz neda nijadperestan. Heta iro Beşikçi dî zindanan de jî qet serî xwar ne kir. Ew dî zindanan de jî vala neskini. Wi, bî xebata xwe ya şoreşgerî rûyên "demokratên" tirk spi kir. Dî zindanan de, dî bin mercên gelek gran de jî rastiyê

got û rastiyê parast. Wek demokrateki dî zindane de jî mafê gelê kurd parast. Heta niha li Tirkîyê wek Beşikçi, demokrat û lêkolingereki zana û mêrxas derneket. Beşikçi dî warê doza kurdan de wiha rexne li "demokratên tirk dîgre: " Sosyalistên tirk qisên tûj dîkin. Ew xwe internasyonalist dibînin û dîzanin; lê ew perdê dîkşînin ser kolonyalizmê û nijadperestiyê."

Dî sala 1978 an de UNESCO biryareke wiha girtî bû: " Mustafa Kemal li dijî emperyalizmê û kolonyalizmê şer kir. M. Kemal miroveki anti-emperyalist û kolonyalist bû. Wi riya rîzgariyê şani gelê Rojhilat da. " û UNESCO sala 1978 an sala M. Kemal elan kir. Jî bîl Beşikçi tu deng jî "demokratên" tirk derneket. Lê, Beşikçi li zindana bajarê Adapazarê, bî rewşeke zanistî, bê tirs û bî mêrxasi, bersiva vê biryarê û bûyera UNESCO ya şaş da. Tewrê şoreşgerî dani.

Dewleta tirk a kolonyalist jî Beşikçi pîr dîtirse. Ne tenê dewleta kolonyala-

list, "demokratên" tirk jî, jî Beşikçi dîtirsin û dîlerzin. Jî ber ku Beşikçi rastiyê dibêje; hebûna netewê kurd qebûl dîke, mafê wê dîparêze!

Lomên me jî dewleta tirk nin in. Lomên me jî welatparêz û demokratên kurd in. Gelo ew jî bo çî, li Beşikçi xwedi dernakevin? Dî kovara Berbangê de li ser gelek mirov nîvisar hatî nîvisandin, lê jî bo Beşikçi qet deng tune. Bî tenê dî hejmara Berbangê ya 11/83 yan de dî derheqê Beşikçi de daxuyaniyek heye; ew jî nîviskarên swêdî dî derheqê Beşikçi de "kampanyeke" vekrine...

Hinek kesên tirk hene, ku li ser "navê demokratîyê" navên van jî devên kurdan qet dernakeve. Gelo ew jî Beşikçi demokrat in, hêjatir in? An jî ev qedera me kurdan e; em dostên xwe yê rast baş nasnakin?

11.09.1985

JÎ FEDERASYON Û KOMELÊN

ENDAM NÛÇE Û BÛYER

DAXUYANIYÊK

Jî xwendevanên Berbangê yê nî derê Swêdê!

Geli heval û hogrên granbîha!

Nîha 250 navnişanên derê lî Swêdê dî destên me de hene. Roj bî roj hin jî zêde dibin. Me, jî pîraniya van navnişanan re, hejmarên Berbangê yê nî 3/85 û 4/85 şand. Lê, ev şandîna Berbangê ya derê welat, lî ser Federasyonê jî hêla abori ve bû bareki gelek gran. Jî bo welatên Ewropa, şandîna kovarek (uceta postexanê tenê) 5 kron û yê nî welatên dî 10 kronê Swêdî dîgre. Jî ber vê yekê, butça me, jî şandîna kovarê jî derê Swêdê re dest nade. Em jî xwendevanên xwe yê nî derê Swêdê tîka dîkin, ku çet ne be, bîla jî kerema xwe re testmîza (uceta) postexanê jî me re bî rê kî! An xwendevanên me, bîla me bîbexşînin, em nîkîrîn bî awekî bî pergîl kovarê jî xwendevanên xwe yê nî derê Swêdê re bîşînin!

JÎ KOMÎTA KARGER A FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ RE

Em wan pêşkêşî we dîkin. Bî silavên dostani!

Komela me, dî civîna xwe ya 25.8.85 an de jî bo endametiya Federasyonê, bî dengdana tevi ev bîryarên jêrin stend.

Komela Demokratîk a Swêdî- Kurdi lî Uppsala Serok

BIRYAR

* Em, Komela Demokratîk Kurdî lî Uppsala, bî derxistîna bîryara Federasyonê ya jî bo hembêzkîrîna kurdên lî Swêdê kêfxweş bûn. Em, dîxwazîn bîdîm zanîn, ku em lî gel xebata Federasyonê ya jî bo yekîtiya kurdên lî Swêdê parastîn û pêşdebîrîna çand û toreyên me, xebat jî bo kurdên lî Swêdê û zarokên me ne kevî nî nav pîşaftîna (asîmlasyonê) çerxa Ewropa, xebat jî bo pîştîgîrî û alîkariya lî berxwedana lî dij qewrandîna hêzên kolonyalist û xebat dî nav insanên me de belavkîrîn û hînkîrîna demokrasîyê û her wekî dîm;

* Dîvê bê zanî, ku komela me, bî serê xwe ye. Federasyon, dîvê wê wek komela Kurdî lî Uppsala nas bîke û bîxêbîte da, ku hemû kurdên ku bîryara yekîtiyê rast dibînin, bîbîn endam.

* Em dîxwazîn civînek gelemperî dibîm dest û gera federasyonê de bê alî pêk bînin.

* Dî civîna ku çêbîbe de dîvê dîtin lî ser destûra federasyonê bîn diyar kîrîn û bîryarek lî ser bê gîrtî.

* Dîvê dî civîna gelemperî de bêyî ku lî endameti û ne endametiya wan bê nerî, hemû kurdên lî Uppsala dîjin wek

endam bîn pejrîndî û bîbî xwedîyê bîjartî û hîlbîjartî.

* Jî derveyî vê, yekîtiya kurdên lî Uppsala bî awakî pratîk, demokratîk nabe jî bo vê dîvê jî jor komîte (û her wekî dîm) çênebîm (jî ber ku evê lî dij berjewenda federasyonê be jî); dîvê bî îrada xelkê tîşt çêbîbîm. Na, heger bê îrada wan çêbîbîm dî dî nav wan de pîrbendî çêbîbîm û dî dijîmînatîya hev bîkî. Jî bo van sedeman, dîvê ev bê mahkum kîrî.

* Jî bo ku ev bîryar derbasê jîyanê bîbî, dîvê ev kesên ku navên wan lî jêr hatîne nîvisandî, jî bo komîsyonê bîn hîlbîjartî û raporên xebata wan jî bo komelê û federasyonê bîn pêşkêş kîrî.

Nav û paşnav

Nav û paşnav

Nav û paşnav

Nav û paşnav

Nav û paşnav

ŞEVA BERBANGÊ

Jî çîrayên pêşerojê —zarokên kurd—re

Kovara Berbangê, lî bere şevêka kulturî jî bo zarokên kurd berhev (çê) bike. Dî vê şevê de zarokên kurd dî çîrok û helbestên xwe bîxwînin. Êdî daxwaza Berbangê jî zarokên kurd re lî Swêdê ew e, ku her jî nîha heya 15-12-1985 an nîvîsînê (nîvisarên) xwe jê re bîşînin û ew helbest û çîrokên ku hûn jî me re dîşînin bîla jî berperekî (rûpeleke) pîrtîr nebin û nehatîbine belavkîrî. Komîta Şeva Berbangê, dî sê (3) helbest û sê çîrokên jî hemîyan baştîr hîlbîjêre û dîyarîyeke hêja jî bo wan pêşkêş bike. Her wîsa ew her sê çîrok û helbest dî de şevê de bêne xwendî.

Komîta Şeva Berbangê, lî benda çîrok û helbestên we ye.

KOMÎTA ŞEVA BERBANGÊ

BELGE

Komîta Pîştîgîrîya gelê kurd û tîrk lî Uppsala û Komela Demokratîk Kurdî lî Uppsala lî gor bîryarên federasyonê hatîtin cem hev û ev bîryar gîrtî:

Dê her du hêz dî nav xwe de komîsyoneke pêk bînin. Komîsyon, dî tîkîliyên xwe bî kurdên beşên dî re jî deyne, civîneke dî bîn gera federasyonê de pêk bîne û program û destûra federasyonê pêşkêşî raberzîne bike û bîryareke lî ser bîde. Komîsyon, dî jî bo tîşteki nû bîryar bigre; dîvê ev bîryar hemû kesî girê bîde.

Bîryarên ku dî civîne de bîn gîrtî, dî eynî wextî de çarenûsiya Komela Demokratîk Kurdî jî bîde diyar kîrî.

28.08. 1985

Lî ser navê komîte

lî ser navê

I.K.D.D.

Îmza

Îmza

Îmza

Îmza

Îmza

Îmza

Îmza

Îmza

LI SWEDÊ
BALYOZXANA ÎRAQÊ
HAT PROTESTOKIRIN

Dî roja 20.09.1985 an de Komela AKSA, Komela Gelê Kurd lî Swêdê û Komela Kurd lî Karlstad bî hev re lî dij rejîma Îraqê meş û mitingek pêk anin. Van her sê komelên endamên federasyonê dî vê meş û mitingê de, kîrîn û bûyerên ku rejîma Baas dî van rojên dawi de lî Kurdistanê Başûr, lî ser netewê kurd pêk tine anin zîman û wan kîrîn û bûyerên nijadperest û barbar protesto kîrîn. Gelek kes dî meş û mitingê de beşdar bûn. Saet dî 12 yan de lî meydana Sergel Torgê de mitingê destpêkir. Lî meydana Sergel Torgê, lî ser kîrîn û bûyerên rejîma diktatoriya Îraqê, bî swêdiaxaftinek hat kîrîn. Bî taybetî dî van mehên dawi de lî Kurdistanê Başûr, rejîma Saddamê diktator bî hezaran kurdên welatparêz û şoreşger girt, avêt zindanan, kuşt û dukje. Bê hejmar kes bî zar û zêçên wan ve jî Kurdistanê Koçebaz kîr û dîke.

Meşvan jî Sergel Torgê heta ba Balyozxana Îraqê meşyan û lî dij rejîma xwinrêj û xwinmêj bandrol û pankartan ve kîrîn. Sloganan avêtin. Lî ba Balyozxana Îraqê slogan hatin avêtin û Balyozxanê protesto kîrîn. Bî axaftineke erebî Balyozxanê cardin hat rûşekîrîn û dawîya meş û mitingê hat.

JÎ BO PAŞVE ŞANDINA MULTECIYÊN KURD FEDERASYONÊ BALA HUKUMET Î MEQAMÊN SWÊDÎ KÎŞAND

Dî van rojên dawi de, sazgeha biyaniyan (Îvandrarvek) û hukumeta Swêd qerar girtin, ku gelek multeciyan kurd paşve bişinin. Lî ser vê bûyeraha, Komita Karger a Federasyonê, dî roja 16 ê meha 9 an de civinek çêkir. Federasyonê rewşa multeciyan kurd dî çav de derbas kîr. Komita Karger a Federasyonê, jî bo rawestandina biryarên hukumetê û yê Sazgeha biyaniyan, ku dî derheqê paşve şandina kurdan de dabûn û dê bîdî namêke şand. Federasyonê, dî nama xwe de bala hukumetê û meqamên Swêdi kîşand ser rewşa kurdan a îroyin. Fotokopiyên namê jî hukumetê, wezaretê biyaniyan, sazgeha Biyaniyan, Xaçasor û jî Komita Efûyê re hat bî rê kîrîn.

KOMITA KOORDINE AGAHDARÎ
DA KOMITA NÛNERAN

Federasyonê, dî roja 22 ê meha Îlonê de bî Komita Koordine û bî Komita Nûneran re civinek çêkir. Komita Koordine —komita Koordine dî kongra Federasyonê de jî bo avakîrîna komelan lî belediyan hatî bî avakîrîn.— dî civinê de,

dî derheqê xebata xwe de federasyonê û komita Nûneran agahdar kîr.

Lî gor agahdariya Komita Koordine, heta niha, bî kêmasi lî 8 komunan (belediyan) imkanên avakîrîna komelan hene.

Komita Koordine niha tevdiya xebata destûrê dîke. Komite dîxwaze bî yek cûreki destûrê komeleyên lî belediyan bî avakîrîn. Komita Koordine dê dî demeki gelek kîn de bî rapor û destûrê ve bî civina Nûneran. Rapor û destûrê raberî civinê bîke.

KONGRA KOMELA JINÊN
KURDISTANÊ PÊK HAT

Komela Jinên Demokrat ên Kurdistanê lî Swêdê, dî navbera 7-15 ên Îlonê de kongra xwe ya yekemin pêkani. Dî kongrê de 42 endam beşdar bûn.

Kongre, jî aliyê endameke Komita amadekar ve hat vekîrîn. Jî bo şehidên Kurdistanê û cihanê, endam û nûner de çîqeke lî piyan dî giramiyê de rawestan. Dî pey hîlbijartina diwanê re, endamên ku dî kongrê de beşdar bûbûn, hatin tespît kîrîn. Diwanê, rojevê pêşkêşî endaman kîr û rojev hat pejrandin. Lî gor rojevê, endamek jî Komita Amadekar rapora xebatê xwend. Endamek dî jî rapora mali raberê kongrê kîr. Piştî pêşkêşkirina raporê, Komita amadekar hat rûşekîrîn. Lî gor rojevê lî ser destûrê munaqêşe hatin kîrîn. Gelek endam dî vê wari de birûbaweriyên xwe dan diyarkîrîn. Dî pey ditin û munaqêşan re hin bendên destûrê hatin guhartin. Jî bo Komita Karger, Komita Çavder û ya nûnerên federasyonê hîlbijartin çêbû. Lî gor daxwaz û pêşniyariyên endaman dî kongrê de hinek biryar hatin girtin û bî birûbaweriyêke xurt ve kongre hate girtin. Hetanî kongra duyemin, organên komelê (Komita Karger û komita Çavder) dê karûbarên xwe lî gor destûr û programa komelê bimeşinin. Jî bo pêşketin û pêştîbîrîna jinên Kurdistanî dî nav civata Swêdê de komelê karûbarên gelek giring daye pêşiya xwe.

XEBATÊN KOMELA ÇAND A
KURD LÎ BOTKYRKAYÊ

Komela Çand a Kurd lî Botkyrkayê, dî meha bori û dî vê mehê de bî bernamêke dewlemend gelek xebat pêk ani. Em dîxwazin, wan xebatên ku komelê pêk ani, xal bî xal lî jêr jî we xwendevanên xwe re raber bîkîrîn:

* Dî vê meha ha de jî komelê kampanya endametiye da domandin. Hejmarê endamên komelê jî 100 i derbaz kîr. Hin ev kampanya dom dîke.

* Komela Çand a Kurd lî Botkyrkayê, dî roja 30.08.1985 an de lî xaniyê Folkethusa Fittjayê bî endamên partiyên siyasîyên Swêdê re, dî derheqê hîlbijartina Swêdê ya gîştîya isalin de civinek pêk ani. Nûnerên Partiyên Swêdi yê ku iro lî parlamentoyê ci girtine, dî derheqê politika partiyên xwe de endamên komelê agahdar kîrîn. Bî taybetî lî ser politika biyaniyan rawestan. Endamên komelê jî dî derheqê gelşên xwe yê heremî û yê kurdan yê gîştî jî nûnerên partiyên pîrs pîrs kîrîn.

* Komita karger ya komelê, bî berpiryarên pirtûkxana Fittjayê re têkîlî danin, ku dî heftê de çend saet zarokên kurdan dî kontrola mamosteki de dî pirtûkxanê de xebata xwendina kurdi bîkîrîn. Lî ser daxwaza komelê, berpirsîyarên pirtûkxanê gelek keyfxweş bû. Dî heftê de 1.30 wext dan zarokên kurdan. Niha qasî bîst zarok bî mamosteki ve lî pirtûkxana Fittjayê xebata xwendina kurdi dîkîrîn.

* Komelê, jî xortên herema Fittjayê grûbeke futbolê çêkir. qasî 20 xortan, dî heftê de 2 car xebata antremaniyê dîkîrîn. Grûba futbolê ya komelê dîxwaze cara yekem bî Kurdistan Spor re maçeke çêke.

* Sazgeha biyaniyan û belediya Botkyrkayê, jî salek zêdetir e, ku jî bo pêşketina zarokên kurdan yê ku lî Botkyrkayê ne, dî heftê de 5 saet projeke xebatê didominin. Îsal dî destpêka dibistanan de dawîya projê hat. Jî bo dirêjkirina projê, Komela Çand a Kurd lî Botkyrkayê, seri lî berpirsîyarê belediya Botkyrkayê xîst. Lî ser rewşa projê raberzîm hatin kîrîn. Komelê daxwaz û pêşniyariyên xwe jî belediye re pêşkêş kîr. Belediyê biryara dirêjkirina projê da. Lê, dê komele û projê jî hev re vê xebata ha, hetanî dawîya perwerdekariya isali bîdominin.

SEMÎNER LÎ SER HEREKÊN KURDÎ
Û KEMALÎZMÊ

Komela Yekitiya Karkerên Demokratên Kurdistanê (YKDK), dî roja 29 ê meha Îlonê de lî bajarê Stochholmê lî ser "Herekên Kurdi û Kemalîzmê" semînerê çêkir. Axaftvanê semînerê Murad Ciwan bû. M. Ciwan, birûbaweriyên Kemalîzmê jî dema Osmani ve girt û hat. Ew, lî ser rewşa siyasîya wê demê rawesta. M. Ciwan, dîr û dirêj lî ser tekîliyên Kemal û Dewleta Osmani û yê biyaniyan rawesta. Lî ser vê rewşa ha gelek çavkani şanda.

Semîner jî du beşan pêk hat. Beşa duyemîn jî, beşa pîrs û bersivên wan bû.



PÊNÇ SALIYA DIKTATORÎ YA FAŞIST HAT PROTESTOKIRIN

S. QERECDAK

Lı Swêdê, dı 12 ê İlonê de isal jı cunta hat protestokırın. Wek salên borı isal jı, dı warê demokratik de Federasyona Komelên Kurdistanê lı Swêdê, pêşengiya pêkanına van karûbarên ku lı dij cuntayê çêbûn kır:

İsal, jı bo meşandına karûbarên protestokırına salvegera cuntayê, Komita Karger a Federasyonê vatını û berpirsiyari da du endamên xwe. Ev her du berpirsiyarên federasyonê, lı gel komita karger, dı 21 ê Temûzê de civinek bı Komita Nûneran re çê kır. Dı vê civinê de her du berpirsiyarên federasyonê pêşbernama xwe ya xebat a 12 ê İlonê, jı nûneran re perpêş kırın. Dı vi wari de pêşniyar û daxwazên nûneran xwestın. Ew bername bı hınek guhartınên biçûk, jı aliye nûneran ve hat pejırandın. Pıştı vê civına nûneran, her du hevalên berpirsiyar, bı komele û komikên demokrat, anti-

faşist yê n kurd, tırk û asuri/suryani û yê n dın re têkılı danın û bı wan komele û komıkan re dı 28 ê mehê de civına yekemin pêk anın. Dı platforma 12 ê İlonê de hatın ba hev û Komiteke avakırın. Bernama xebatê ya 12 ê İlonê forma xwe ya dawı girt.

Lı gor bernama xebatê ya Komita organiya 12 ê İlonê, van karûbarên jêrin pêk hatın:

Beriya 12 ê İlonê lı Tensta, Fittja û lı Söderteljê bı kurdi û tırki belavok hatın belavkırın. Belavokên bı zımanê swêdi jı lı hemû sentrumên (merkezên) taxan hatın belavkırın û bı swêdi pankart û bandrol hatın vegirtın.

Dı 6 ê İlonê de lı bajarê Uppsalayê şeveke protestoyi çêbû. Ew şev, girêdayiyê Komita merkezi bû û jı aliye Komita Uppsalê ve hat organizekırın. Dı şevê de bı tırki û kurdi belavokên Komita merkezi

hat belavkırın.

Dı roja 7 ê İlonê de, lı bajarê Stockholmê lı salona Medborgarhusetê şevê çêbû. Dı şevê de jı 400 kesi zêdetır mırov beşdar bûn. Ev şev bı kurdi û tırki hat amadekırın. Cara yekem bû, ku Federasyona Asûriyan û Komela pêşverûyên suryaniyan pıştgiriya şevê kırın. Dı şevê de axaftın. Bı folkloraxwe reng dan şevê. Ew têkılı û pıştgiriya asûri/suryaniyan gaveke gelek baş û pêşketi bû. Dıvê têkılı hin jı germ û xurt bıbın.

Bı navê Komita protestokırına 12 ê İlonê, jı bo beşdarbûna rojnamevanan, radyo û televizyona swêdê, jı rojnamevan, radyo û sazgeha televizyonê re name hat şandin. Lê, mıxabın nûçegihanên rojnamevan, radyo û televizyone ne hatın.

Dı roja 12 ê İlonê saet dı 18 an de lı

meydana Sergel Torgê mitingek çêbû. Lı ser hatın û kırınen 12 ê İlonê bı tırki, swêdi û kurdi axaftın hatın kırım. Meşê destpêkır. Heta Balyozxana Tırkiyê ya lı Swêdê lı dij cunta faşist bandrol û pankart hatın vekırın û bı swêdi, kurdi û bı tırki slogan hatın avêtın. Lı ba Balyozxana Tırk, bı merşa netewi ya kurd şehidên kurd, tırk û yêñ dın hatın biranın. Beşdarvanan bı sloganan Balyozxanê protesto kırım. Ê wilo dawiya meşê û mitingê hat. Dı mitingê û meşê de qasi 450 kesi beşdarbûn.

Qasi ku me ji dît, dı pêkanina van karûbaran de hnek kemasiyên me yêñ teknik û pratik çêbûn. Lê bı van kın û kemasiyan ve hemû tevgerên lı dij hatına 12 ê İlonê bı awaki serfirazi derbaz bû.

Dı hezırkırın û pêkanina karûbarên protestokırına 12 ê İlonê de Komita Pıştgiriya yekitiya Çep (SOL-BİRLİK) roleke negatif leyist. Ev Komite heta dereki kete nav xebatê, lê paşê bı tewrê xwe yê du ali lı derê Komita Organizekırına 12 ê İlonê ma. Ê beşdarê tevgerên karûbarên protestoyan ne bû. Bı serê xwe ma. Ev tewrê negatif cara yekem bû, ku lı Swêdê yekitiya hêzên lı dij faşizmê dı 12 İlonê de cûda kır.



AXAFTINA 12.Ê İLONÊ

Geli Hevalan!

İro, pênc saliya karina generalên faşist tije bû. Ji bo lanetkırına diktatoriya faşist, dı çav de buhradın û hêjandına xebatên bohri û ji bo daxwaz û hêviyên pêş, dı salên bohri de ji, em lı vê derê civiya bûn.

Terora faşist lı Tırkiyê û lı Kurdistanê Tırkiyê bı dijwari û barbari tê domandin. Ew, beriya her kesi û her tiştî êrişê hêzên welatparêz û şoreşger dıkın. Ji sedemê liveke biçûk, tevayiya gel ji xwe re dıkın hedef. Bûyerên ku iro lı Kurdistanê pêk tên, minakên heri mezin û berçav in.

Ordiya dagerker (işgalkar) ji nû ve Kurdistanê dager dıke. Keda gel fir dıke û xwinê gel dirjine. Aletên eşkencan, eşkencexane û metodên eşkencan dı van salan de her ku çû zêde bû. Lı gor beyanên cuntayê dı van salên dawi de bı deh hezaran kes, dı eşkencexanan de bı aletên modern dı eşkencan û lêdanê de derbas kırım.

Dadgehane (mahkeman) ji nû ve bı dehan fermanê bı dardekırınê dan û ji hezaran kesên anti-faşist re cezayên

giran dan û dıdın. Lı Kurdistanê bê hejmar kesên welatparêz bıdızı dı keminan de kuştın.

Ji aliye dın ve abori roj bı roj dıbzıde û dıpelşe. Zem û buhabûn ketine rêzê. Mala gel dışewtine. Bêkari bê hed û bê hesap e. Êdi kes nıkare jê re çare bibine û pêşî lê bıgre. Ji bo vê yekê qet plan nin e. Hêvi û guman tune. Qaşo faşizm enflasyonê dê kêm bıkira û daxıstana jêr; sala bori kar û hedefên wan ev bûn. Dawi fiyasko bû. İro enflasyon dı % 50-60 i dibine. Fırotına derveyi (export) wek plan û hesabên wan derneket. Dı bazırğaniya derveyi de gelek vekri heye; dên zêde dıbe. Dı politika derveyi de gelek guhartın çêbûn. Politika Emerikaya Yekbûyi, NATO û hevalbendên wan yêñ êrişkar bê gotın têt ci. Proje û plana Reagan a "Şerê Stêrkan" ya ku hemû mirovahiyê dıbe felaketên mezin hat destek kırım. Dı girava Kıbrısê de ji bo Komara Tırk a lı Kıbrısê ya Bakûr gavên kevneperest hatın avêtın. Lı dij dewletên cıran wek Suriye, Yewnanistan, Bulgaristan kampanyên dijimni vekırın; ji bo pelçıkandın û belavkırına hêzên netewi-

demokratik yêñ Kurdistanê êrişên Kurdistanê İraq û İranê dıkın.

Lı dij gelê Filistin û hêzên anti-imperyalist û pêşverûyên ereban dijimni dıkın. Cunta, bı dijimnê gelê ereb wek Mısır û Suudi re têkiliyên germ pêşve dıbe û zêde dıke.

Dıxwazın pakteke grêdayiyê Emerikaya Yekbûyi pêk binın. Bazariya wê dıkın.

Geli xwuşk û bıran!

Dı ser hatına cuntayê de 5 sal derbaz bû. Bı hewqas tade, lêdan, zılm û zordariyê, baweriya me naşke; pêşveçûna dirokê bê guman e. Lê, isal em hin ji, ji bo pêş bı birûbaweri ne. Bı qerar in.

Ev bı tenê hêviyên vala nin in. Sedemên berçav hene. Dijmın roj bı roj jar (zayıf) dıbe. Generalên faşist destekgırên xwe yek bı yek wenda dıkın. Gel, hêdi hêdi dengê xwe bılınd dıke û tırsa wê dışke. Dı fabrikan de, ciyê kar de, lı Kurdistanê, lı gundan êdi munaqesên prsên politik û civaki tê kırım. Lı çareserkırına wan dıgerin. Gel dısa

bı şeleke aktif dıkeve nav politikayê.
Lı Kurdistanê, ordiya dagerker, bı çekên modern û bı hemû imkanên xwe, bı metodên barbar êrişên xwe didomine. Lê, lı Kurdistanê nıkarın a-gırê azadiyê vemrının.

Partiya ku bı qanûna cuntayê hatibû avakırın; lı İstanbulê mıtıngek çêkr. Lı ku ba İstanbul, vedigeriya rojên xwe yên berê. Lı İstanbul, lı meydana Saraçxanê bı sloganên "Bıla bımre faşizm, bıla deriyên zindanan vebın" deng da. Ev ji da xuyakırın ku lı dij faşizmê potansiyeleke hêz û xurt heye.

Demokrasiya derewın na xebite. Partiyên ku bı emrê cuntayê hatı bûn avakırın, dıhelın, dıqedın û dı şûna wan de hinekê dın ava dıkın.

Hın gelek sedem hene, ku em bı hêvi û bawermend bın. Dıvê û pêwist e, hemû hêzên anti-faşist refên xwe û hêzên xwe bıkın yek. Lûleyên çekên xwe bıdın dij-mın.

HER BİJÎ BIRATIYA GELE TIRK,
KURD Ê YÊN DIN Ê TEKOŞINA
WAN!

BILA BİMRE FAŞİZM!



Geli xwendevanên hêja!

Jı Komita protestokırına 12 ilonê gelek mesaj û silavname hatın. Lê ji bo ku gelek ci dê bigre, em nıkarın hemû mesajên ku ji Komitê re hatı bû, dı kovarê de bıweşının. Jı ber vê yekê em dıxwazın ji wan mesajan du minak bıdın û yên dın ji navên komele û rêxıstınan lı jêr bınvıvısının.


MESAJ

Jİ KOMİTA 12 Ê İLONÊ RE

Hevalno!

Lı Tırkiyê ji 12 ê İlonê vır de ku cunta faşist dest daye ser hukum; lı ser hêzên demokrat û pêşverû tada û eşkencên nedıtı pêk tine. Faşist Evren û hevalbendên xwe bû 5 sal in, ku ji gelên Tırkiyê û çına karker re ji bil xesarê tû tışteki ne feyde ne ani û dê ne yine ji.

Em Federasyona Asûriyan, piştgiriya pêk anina karûbarên Qomita 12 ê İlonê dıkın û lı gel vê em bawer in, ku bı piş-



Koma folklorê Komela Yekitiya Demokratên Kurdistanê folklorê dorhêla Çolemerigê pêşkêş dıke.

giri û hevkarıya tekoşına hêzên şoreşger û pêşverû yên Tırkiyê, dıkarın hukmê faşizmê hilweşının.

Bıla bımre cunta faşist û hevalbendên wê!

Bıla bımre hemû hukmên zordar!

Biji piştgiri û hevkarıya gelên Tırkiyê. Bı silavên şoreşgeri!

07.09 1985

FEDERASYONA ASURÎ LI SWEDÊ



Folklor Federasyona Asuriyan şeva 12 ê îlonê hin geş kr.

GELÊ ASURÎ, JI GELÊ ROJHILATA-NAVÎN YA KEVIN YEK E. JI HEZAR SALAN VIR VE GELÊN ASURÎ Û YÊN KURD WEK BIRAN BI HEV RE JIYANE. CÎRANEN HEV YÊN KEVN IN. HER DU GELAN BI HEV RE GELEK SALÊN ŞAYÎ Û REŞ Û GIRAN JÎ, DÎTIN E. WEK JI HER ALÎ VE, JI ALIYÊ KULTUR Û PÎŞE VE JÎ, GELEK AFIRANDINÊN HÊJA Û QENC PÊK ANÎNE. DI DÎROKA ROJHILAT A NAVÎN DE JÎ BO PÊŞVEÇÛNA ÎNSANETIYÊ BÊ HEJMAR KARÛBAREN GIRANBIHA PÊKANÎNE. ÎRO, LI DIJ KOLONİYALÎZME HÎ M ZÊDETIR PÊWÎSTIYA HER DU GELÊN BINDEST BI HEV HEYE.

AXAFTINA ŞEVÊ

Heval û hogirên hêja!
Îro 12 ê Îlonê, ji bo protestokirina salvegera 5 saliya cunta faşist, em li vê derê civiyane.

Bi tada û zilma siyasi, netewî û aboriya iktidara Tirkîyê ku ji berê ve hetani iro berdewam dîke, gelê me ku bi hezar salan in li ser axa xwe jiyana xwêdomandîye û hatiye koçkîrîn.

Em wek pêşverûyên Suryaniyan, daxwaz û tekoşîna me ji bo pêkanîna eniyekî li dij faşîzmê ye. Ji ber ku cunta dixwaze me hemûyan ji navê rake. Ji bo vê sedemî li welat û li derveyê welat girîngiya eniyê zêde bûye. Em wek

heretekeke siyasi bi navê ÎDSUB ê, li her derê ku gelê me diji, ji bo mafên gelê me yê demokratîk, aştî û mirovahiyê tekoşîna xwe didominn. Ji bo serfiraziya van tîştan em pêwestiya piştgiriya rêxistin û partiyên pêşverû, demokrat-şoreşger û sosyalist yê ku ji bo rizgarkirina gelan dixebitî dîkin û piştgiriya xwe ji wan re diyar dîkin.

Biji hevkarîya gelên kurd, türk, suryani û yê nî!

Bimre cunta faşist a leşkerî!

YEKÎTIYA DEMOKRAT-PÊŞVERÛ
YÊN SURYANIYAN

MESAJÊN DIN

- * Federasyona Asuriyan li Swêdê
- * Navendiya Çanda Kurdistanê
- * Komela Pîtgirtiyê
- * Karkerê Şoreşger-lî Swêdê
- * KOÇ-KAK li Swêdê
- * KKDK - lî Swêdê
- * Komita piştgiriya Riya Şoreş
- * TKP/B Rêxistina Swêdê
- * KUK - liqê Swêdê
- * Kawa
- * KOM DER
- * Komita hevalbendî û piştgiriya gelên Kurd û Tirk li Uppsälê

bersiva "rexnê"

NÎJATPERESTÎYA BERBANGÊ

Û ÎNTERNASYONALÎZM

Pîştî derketina hejmara Berbangê ya 3/85 an — Ku pîştî kongra Federasyonê ya awerte ew hejmara kovarê ya yekemin bû.— Zınarê Xamo, ji redaksiyona Berbangê re, nivisareke tûj û dirêj şand. Me, ew nîsîsara Zınarê Xamo bi navê "REXNE" di hejmara berbangê ya 4/85 an de, di rûpelên 9, 10 û 11 an de weşand. Û me li bin nivisara "REXNE" nivisandî bû, ku "em dê, di hejmara 5 an de bersiva "REXNA" Zınarê Xamo bidin."

Bi rasti me, ne dîxwest ku bersiva "REXNA" Zınarê Xamo bidin; bila xwendevanên Berbangê wê "REXNA" ha bihêjandan! Lê, Zınarê Xamo, di "REXNA" xwe de gelek idia û ithamên mezûn û gran li nivîskar û redaksiyona Berbangê dîke. Ji ber vê yekê ji, me, pêwestiya bersiva "REXNA" wi dit.

Em dîxwazin, bi pîrsa "rexne çî ye" dest bi nivîsara xwe ya bersivê bikin. Rexne, ne peyv û sloganên ajite ne. Rexne, ne eqilmendi, şîret û gazin in ji... Bi nîmaze rexneyên kesên şoreşger, ji yê kesên dîn cûda ne... Kesên şoreşger ji rexneyên xwe re bîngêhên zanîstî, berçav û mînakên rast tinin. Rexneyên wan kesan, ji bo pêşketin û serfiraziya cîvak, rêxistin, sazgehan û kesan in. Divê kesên rexnegir, bi awakî hisî û pozbîlîndî rêxistin, sazgehan û kesan biçûk ne binin û êrişên şexsiyetên wan ne kin. Çaxa armanca rexne û rexnegiran ev yek be, rexne, ji rexnetiyê derdikeve. Û ew çax ji armanca û xebata rexnegiran dibe tîsteki dîn!

Îca em vegerin ser rexna Zınarê Xamo. Zınarê Xamo, ji hêla wêjeyî (edebî) ve dest bi rexna xwe dîke û pêkenina Brindar a "TIRK, EREB Û ECEM" perçe digre û wiha dînivîsîne:

"Rast navê pêkeninê hatiye nivîsandin, lê tû tîkîliya nivîsê û pêkeninê bi hev tune. Û ji aliyê edebî ve ji qet pênc quruşî nake."

(Berbang hejmar 4/85, rûpel 9)

Lê, heval Brindar ji di nav de qet da-

xwaz û idiyeyeke redaksiyonê wiha nin e, ku ji hêla edebî û yê dîn de kesên pêşketî û hêz in. Ew çax tîsteki gelek normal e, ku di vê babet û wari de xwendevan rexne li me bigrin. Ji xwe armanca redaksiyonê ji, yek jê ev e, ku ew kesên ku li derê redaksiyonê ne, bi nivîsarên xwe yê hêja û giranbîha Berbangê ji her hêli ve pêşve bibin û qelita wê qenc û bilind bikin! Em di wî wari de benda nivîsarên Zınar Xamo bûn; lê hezar bixabî "REXNA" wi tenê ji me re hat!

Zınarê Xamo, di nivîsara xwe ya "REXNE" de, ji hêla edebî de dergeh û deriyan, ji rexneyên xwe re vedike û pênuşa xwe tûj dîke û vedigere bransa xwe ya îdeolojîk û politîk. Zınar, ji nivîsara Brindar a "TIRK, EREB Û ECEM" hevokan (cumlan) digre:

"Bi hawakî gelek eşkere nijadperestî tê kîrî, ji gelê Tirk, Ereb û Fîrîs re bi hawakî pîrr qebe xeber (çêr) tê dain." (Eynî nivîsar stûn 3)

Zınarê Xamo, dîxwaze bi leystîka bêjan (kelîman) demagojî bike. Zınar, bi leystîka bêjan ji redaksiyonê, hinek endam û nivîskarên wê re keminên nijadperestiyê çêdike. Lê, ew bi xwe dîkeve kemîna xwe û dîke na ke nîkare ji kemîna xwe derkeve. Dîpîrpite û dîpîrpite...

Ka em binêrin, nijadperestî çî ye û li ku derê nijadperestî hatiye kîrî!

Nivîsara Brindar a "Tirk, Ereb û Ecem" wiha destpê dîke: "Di wextekî kurdan ji xwe re qesreki ava kîrî bû." Ev hevoka nivîsarê ya yekemin e. Gelek vekîriye, ku nivîsar qala dema berê dîke. Dema Osmanî, an ji hin berê... Ev yek. Ya duyemîn ev pêkenin ji aliyê gel ve hatiye afirandin. Gelê me dema qala barbarîya dewletên Tirk, Ereb û Ecem dîke navê çin û çadên wan na de. Qesta gel, ew siyaseta dewletên barbar û zîlmkar e. Û heta iro ji, Tirk, Ereb û Eceman dewletên xwe yê demokrat û proleter ji ava ne kîrî, ku em bîjin, "mîrov nîkare li ser wan dewletan wiha bîbêje." Ya sîsêyan, wek me berê ji gotî bûn, Zınarê Xamo, bi gotî-

nan (kelîman) mana nivîsarê dîguhurine û dîxwaze bi gotîman demagojî bike û serê hinek xwendevan tevli hev bike. Di nivîsara "Tirk, Ereb û Ecem" de qet qala "gel" nayê kîrî. Di tevahiya nivîsarê de gotîneke wiha nin e. Bi tenê sê gotî hene: "Tirk, Ereb û Ecem." Zınarê Xamo, gotîna "gel" li nivîsarê zêde kîriye û bi vê gotîneke dîxwaze naveroka nivîsarê biguhurine. Ji ber ku di literatûra siyasî de gotîna "gel" maneke wê yê girîng heye û temsîla karker û xebatkarî dîke. Ji vî sedemî naveroka Hevoka (cumla) "Tirk, Ereb û Ecem" û ya "gelên Tirk, Ereb û Ecem" ne yekî. Ji hêla civakî û politîk de mana her du hevokan gelek ji hev dûr û cûda ne. Zınarê Xamo, bi vê leystîka xwe ya hêsa, dibêje "Berbang nijadperestiyê dîke." Nijadperestî idia û ithameke gelek mezûn û giran e. Nijadperestî ji federasyon û ji kovara wê ya Berbangê re rûreşî ye. Em bawer in, ku Zınarê Xamo, piçek bi sereke hêsa, baş û hûr û kûr bîfîkîriya dê ve idia û ithama xwe ya giran ne kîra! Ji lew re nijadperestî ditin û îdeolojiya karbîdestan e. Di dema me de nijadperestî û faşîstî bi hev ve hatîne hunandin û grêdan. Gel û neteweyên bîndest li dijî nijadperestiyê tekoşin didin û şer dîkin. Neteweyê kurd ji, ji wan neteweyên bîndest yek e. Ji bo mafê xwe yê demokratîk û netewî li dijî nijadperestan, di berxwe dîde û şer dîke. Ew niha tekoşîna netewî û civakî dîde, gelo çawa dibe nijadperest? Ji aliyê dîn ve ji ka kîjan hêz û kesên nijadperest di nav federasyona kurdan de ne? Baş e, ku her kes ji nêz ve hev du nas dîke. Di bû, ku hinek kesên dîn ji ji me bîketana bêgumanîyê...

Zınarê xamo, bi zor û bela û bi çar destan nijadperestan girtîye, ma berdîde... û dom dîke:

"Di vir de mesaja ji xwendevan re tê dayîn ev e: Tirk, Ereb û Ecem û Fîrîs barbar in. (em nîzanîna Zınarê wê gotîna "Fîrîs" ji ku derxistî ye, ji lew re di nivîsarê de gotîneke wiha nin e.) baş e,

gelo redaksiyona Berbangê ji wiha difikire? "

Zınar baş dızane ku hemû endamên redaksiyonê ne ji siyasetek in û xwedi yên birûbaweriyên cûda cûda ne. Lê dî warê netewî û demokratîk de hatine ba hev û bî hev re kar û xebat dîkin. Dî vê çarçove demokratîk û netewî de ji bî navên xwe dî Berbangê de nîvisar dînvîsin. Dî vê çarçove û prensîbên demokratîk û netewî de jî, nîvisarên cûda cûda jî gelek tişteki normal e. Berbang lî gor van prensîban e. Federasyon û kovara wê Berbangbûçar sal in, ku lî ser himê van prensîban dimeşe. Politik û prensîbên berê, niha jî dî jîyanê de ne. Qet guhartîne nûnin e. Lê tişteki heye, ku hinek komiteyên karger yêni berî me, car caran jî politîka û prensîben federasyonê û Berbangê dîr dîketin û wan bî ci ne daniyan. Teng û grubî difikriyan; heger guhartin hebe, ev e. Redaksiyona Berbangê, Nîjadperest nin e. Lî dij nîjadperestiyê, barbariyê û kedxwariyê ye. Gelên Tirk, Ereb û Ecem, jî xwe re û jî gelê xwe re, dost û bira dibîne. Lê belê burjuvazî û dewletên wan jî xwe re û jî gelê xwe re jî, dijîmî dibîne, barbar û wahşî dibîne. Heta ku jî destê redaksiyonê bê, dê dijîmîniya wan bike. Wek Zınarê Xamo jî van her du tiştan jî tevli hev nake. Jî bil vê yekê redaksiyona me, gelek kêmasî û çewtîyên xwe qebûl dîke. Lê, idîa û ithama nîjadperestiyê esla! Û redaksiyona me, vê idîa û ithama pûç û vala jî xwe re heqereteke giran û mezin dibîne!...

Zınarê Xamo, "nîjadperestîya Berbangê" tenê bî nîvisareke nade diyarkirin. Bî eyîni idîa û ithamî, bî nîvisara A. Tigris jî du gotin digre û wan yek bî yek minakên (misalên) nîjadperestiyê şandide. Zınarê Xamo, wiha dînvîse

" dî vîr de du idîayên gelek ciddî hene. Yek kurd jî hemû biyaniyan (xeriban) ku lî Swêdê dijîn aktîftir in. Dudu kurd jî hemû biyaniyan hêjatir in. Lî gor bawerîya min idîa "aktîftir" bûnê bes idîa ye, jî bona ku meriv karîbe bibêje kurd jî hemû biyaniyan "aktîftir" in divê dî destê meriv de hin tişt hebî. Û divê bî kêmasî meriv bîzanibe, hemû biyaniyan çî dîkin, çawa dîxebîtin. Û dî re jî meriv xebatên wan û yêni kurdan bîde hember hev, hela ka gelo ki pîr "aktîf" e. Ez bawer nakim ku A. Tigris xebatên hemû biyaniyan jî nêz ve bîzanibe. Mesela gelo bî çî hawayî em kurd jî Îraniyan û Latînerîkiya "aktîftir" in? Ev yek jî bo min ne zelal e, dikare lî ser munaqêşe bibe. Lê A. Tigris, qet rîya munaqêşe tê de ne hiştiye, " kurd jî hemû biyaniyan aktîftir in."

Me berê jî gotî bûn, Zınar jî aliyê gotin hîlbîjartîne û gotin çêkîrîne de gelek hunermend e. Bingehê rexna xwe lî ser leystîka gotinan pêk tîne. Wek gotîna "aktîf" û "hêja." Zınar bî leystîka van her du gotinan, A. Tigris jî dîke nîjadperest. Lî

gor birûbaweriyên Zınarê Xamo, mirov bêje; "kurd jî hêla politik ve jî hemû biyaniyên ku lî Swêdê dijîn aktîftir û hêjatir in" dibe nîjadperest. Nîjad bî mana soy-sop, îrk e. Nîjadperestî jî îrkçîtî ye. Ka, îca A. Tigris lî ku nîvisandîye, ku "kurd jî hêla îrk ve, jî xwin û eslê xwe ve jî hemû biyaniyan hêjatir e"

" Kurd jî hêla politik ve aktîftir û hêjatir in" tê wê manê ku jî aliyê îdeolojîk û politik ve jî yêni dîm pêşketîne, xwedîyê birûbaweriyên sosyalîst û pêşverû ne. Yanî ew "internasyonalîzma ku Zınarê Xamo qala wê" dîke, dî wê hêlê de jî grubên biyaniyan yêni dîm pêşketî ne. Jî hêla îdeolojîk û politik ve Îranî û Latînerîkî jî lî navê ne. Hemû kurdên ku lî Swêdê dijîn vê meselê baş nas dîkin. Îro, Kurdên ku lî Swêdê dijîn pîraniya wan rewşenbîr in, xwendevan in, xîrab-baş dîsa pîraniya kurdên lî Swêdê, bî salan dî nav tevgerên kurdan de ci girtîne, xebîtîne. Kadroyên pêşketî îro dî nav kurdên Swêdê de hene. Ev rastîyeke berçav e. Meqamên swêdî, bî xwe par (sala borî) lî ser grubên biyaniyan yêni ku lî Stockholmê dijîn lî kolîn çêkîrin. " Dî nav grubên biyaniyan yêni ku lî bajarên Stockholmê dijîn, gruba kurdan jî hemû, gruban xwendevan in, rewşenbîr in û aktîf in, lî problemên kurdan jî hemû gruban jî, zêdetir in," gotî. Ev lî kolîna ha, dî rojname, radyo û televîzyonên xwe de jî weşandin. Gelo Zınarê Xamo çima vê idîayê davêje ser A. Tigris. Gelo ew bî xwe vê rastîya berçav neditîye an jî na bîne? Û Zınarê Xamo, dibêje ku " A. Tigris jî vî ya re rîya munaqêşe jî nehiştiye." Em tê nagihîn Zınar, ev idîa xwe jî ku derdixe, dî nîvisarê de idîayeke wisa nin e. Gelo çima A. Tigris rîya munaqêşe lî bigre.

Zınarê Xamo dî nîvisara xwe ya "Rexne" de du metodên taybetî bî kar tîne: Metoda yekem hîlbîjartîn û çêkîrîna gotinan e û ya dîm jî, biçûk dîtin e. Zınar, vê metoda xwe wiha bî kar tîne:

" ... Ez bawer im, ku A. Tigris baş bî civaka Swêd nîzane.."

Zınarê Xamo mirov dîke du dîl, gelo dî vî wari de kar û xebatên Zınar hene?

Zınarê Xamo şîretên xwe dîde domandin û dibêje " Divê meriv internasyonalîst be." Û rast e, meriv internasyonalîst be tişteki gelek baş û hêja ye. Lê, internasyonalîzma wek ku Zınar dibêje û diparêze, ne ew e, ku meriv hebûna gelê xwe bîde înkâr kîrin. An jî meriv lî ser navê internasyonalîyê jî kurdîtiya xwe şerm bike. Zınar wek dî her babetî de, dî vê babetî de jî, her tiştî lî nav hev dixe. Barên giran dîde ser rêxistinên demokratîk " divê internasyonalîst bîn." dîbêje.

Zınarê Xamo, lî nîvisara Welatevîna bî navê " Alternatîfa Federasyonê" jî rexne digre û bî metoda xwe ya taybetî

êrişê wî jî dîke. Zınarê Xamo, wiha dibêje:

Welatevîna qala demokrasîyê dîke, lî belê hin tê ne gihîştîye demokrasî çî ye."

Zınar, îca dest bî dîsa demokrasîyê dîke û Welatevîna bî durûtîyê îtham dîke û wiha dînvîsîne:

" du nûneran tenê gotî federasyonê demokratîk e. Nûnerên dîm hemû lî dij vî ditîne derketîn."

Gelo du (2) nûner çawa karî bûn dî kongrê de bîyara komelên belediyan (kummunan) bigrî? Zınar çî zû bîyera kongrê jî bir kîr. Bîyer jî bir bibe, bîyar jî, jî bir dibe!... Dî kongrê de bîyara avakîrîna komelên lî belediyan bî 40 dengên nûneran hatî qebûl kîrin. Bî tenê 8 nûner lî dij bûn. Zınarê Xamo, bî xwe jî dî nav wan 40 nûneran de ne bûn? Heger Zınarê Xamo jî bir kîriye em karî bînin bîra wî ku ew pêşniyariya komelên lî belediyan, Zınar bî xwe anî bû û pêşkêşî dîwanê kîrî bû. Ew pêşniyariya ku Zınar bî destê xwe nîvisandî bû niha dî arşîva federasyonê de ye. Dibe ku Zınar poşmam bibe, ev tişteki normal e. Lê, belge lî ciyê xwe ye...

Zınar, dî babeta demokrasîyê de jî, bî zanatî rêxistinên gîrsî yêni demokratîk û partîyên siyasî tevli hev dîke. Xwe tûj û çep nîşan dîde û yêni dîm jî rast û heta nîjadperest. Federasyonê dîke şûna partîyên komunist û Berbangê jî dîke şûna organên wan. Jî partîyên komunist minakî dîde. Qaşo çewtî û şaşîyên dîyar dîke, ew bî xwe dî wan çewtî û şaşîyan de dîçe xwarê û lî ku be dê tê de wen da bibe. Gelo Zınarê Xamo ferqîyeta navbera rêxistinên demokratîk yêni gîrsî û yêni partîyên siyasî nîzane û nabîne? Heger ferqîyeta van her du cûrên rêxistinîna tune, ew çax hebûna van rêxistinên demokratîk çî ye û jî çî re dîbîn?

Tişteki dîm jî, heye, ku ew her nîvisarên ku dî Berbangê de derdîkevî, ne ditîna

hemû endamên redaksiyonê ye, an jî yêni çend kesan e. Û nabe ditîna Berbangê ya fermî. Bî tenê tişteki heye, ku ne lî derê prensîbên Berbangê be, ew nîvisar kare bê çapîrîn û weşandin. Ew çax, ew nîvisar xwedîyê xwe girê dîde. Zınar gazîman dîke û dibêje " hun çawa wan nîvisaran çap dîkin? " Lî gor ditîna Zınar, ew nîvisar dîbîn ditînen hemû endamên redaksiyonê.

Bî rastî ciddîyeta "Rexna" Zınarê Xamo, lî ser nîvisara 15-16 ê Hezîranê jî xwe baş dîde dîyar kîrin. Zınar jî bo rexne bigre her tişt nîvisandî ye.

A. Tigris- Brindar- S. Qerecdax

JÎ KURDÎSTANÊ NÛÇE Û BÛYER

CUNTA FAŞİST PROVAYÊN

KURD QIRKIRIN Û

WÊRANKIRINA KURDÎSTANÊ DIKE

Cunta faşist dî roja 30.09.1985 an de lî Kurdistanê Tirkîyê bî nave 'Sancar 85' tatbîqateke gelek mezin pêk ani. Ev tatbîqat 5 roj dom kir. Lî gor nîvîsandîna rojnemeyên tirkîyan tatbîqata 'Sancar 85' jî şerê cihanê duyemîne heta îro lî Tirkîyê tatbîgata herî mezin û fireh bû. Qada tatbîgata 'Sancar 85' jî bajarê Ruhayê (Urfayê) heta bajarê Wanê (Van) da ber xwe. Yanî qada tatbîqatê seranser Kurdistan bû.

Tatbîqata 'Sancar 85' jî aliyê hêzên Erdê yê Tirkîyê û ordiya duyemîne ve hat plan û koordine kirin. Jî bil hêzên Erdê yê Tirkîyê û ordiya duyemîne, hêzên Hewayî, jandîrme, Hîvasor û Meterolojiyê yen êrişkar jî dî tatbîqatê de beşdar bûn. Dî tatbîqatê de cara yekem bû, ku fişekin heqîqî hatin xebitandin. Personalên nexweşxana aqademîya Gulxanê ya leşkerî jî dî tatbîqatê de ci û vatani girtin.



Kenan Evren, lî Hilwanê tatbîqatê temaşe dike.

Tatbîqatê 5 roj dom kir.

Kenan Evren û hemû gîralên faşist bî balafirên taybetî çûn Kurdistanê. Berê çûn bajarê Diyarbekirê û paşê bî helikopteran çûn Devegeçidiyê. Devegeçitî çend kilometre re dûrê Diyarbekirê, qerargahê çolordîya 7 an e. Lî Devegeçitîyê, ordiya dagerker, dî derheqê 'Operasyona Guneş (roj) de brîfîngê çêkir. Hemû gîralên faşist beşdarê brîfîngê bûn û jî bo plan-xebatên pêş dîtinê xwe diyarkirin. Plan û programên nû çêkirin. Kenan Evren bî hemî gîralên xwe ve, bî helikopteran çûn Hilwanê (Hilwan navçaya bajarê Rûhayê) û lî tatbîqatan temaşe kirin.

Ew gîral û kesên ku beşdarê tatbîqatê bûn ev bûn:

Serokê komara Tirk Kenan Evren, serokê Hêzên Leşkerîyê gîştî, orgeneral Necdet Urug, Wezirê şerê Yavuz Turk, Komutanê hêzên Erdê (reşahî) orgene-

Evren yakından izledi Cumhurbaşkanı Kenan Evren, Urfa'nın Siverek ilçesinde düzenlenen "Orgeneral Semih Sancar-85" tatbikatını, Çermik-Siverek karayolunda kullanılan "seyir çadırı"ndan Milli Savunma Bakanı Zeki Yavuztürk, Genelkurmay Başkanı Org. ecdet Üruğ ve öteki komutanlarla izledi.

Güneydoğu'da KUŞ UÇURTULMUYOR

ral Necdet Özturan, Komitanê Hêzên Hawayî Orgeneral Halil Sozer, Komitanê Hêzên Jandîrme yê Gîştî Fikret Oktay, Endamên Komîsyona Parastîne ya parlamentoya Tirk, Komitanê ordiya duyemîne orgeneral Adnan Doğu, Komutanê ordiya sêyemîne orgeneral Hüsnü Çenkler û hw.

Ordiya Tirk a faşist û dagerker dî vê tatbîqata xwe ya herî mezin de bî sedan

debdebe, çekên modern yê gîranxebitand û bî hezaran leşker bî kar ani. Jî bo prova kirina kurd qirkirîne û wêrankirina Kurdistanê, dî erdê û de hewa de bî hezaran bomba û roketên heqîqî avêtin. Heremen tatbîqatan birojan dî nav tefre dûmanê de man. Gelek çekên Amerika yekbûyî dî vê tatbîqata ha de hatin cerbandin. Pîsporên NATO, bî xwe dî tatbîqatê de beşdar bûn û encama çekên



Cunta gundiye'n dorhêla çiyayê Agriyê ber hev dike.

xwe dînerin. Kêmasî û serfirazî yê'n ordiya Tirk a dagerker dîtrandin.

Lî hînek heremên tatbiqatê şewat derkîtin. Agir bî erdê ket. Dar û berên ku hebûn dî tatbiqatê de û dî dî re şewitîn.

Kenan Evren û hemû generalên wî yê'n faşîst piştî temaşekirina tatbiqata Sivêrek-Hilwanê, bî helikopteran îca firiyan û çûn Tatwanê. Tatwan navça bajarê Wanê ye. Jî lew re lî herema Wanê jî dî eynî tarihan de tatbiqat hebû. Ew jî perçek jî ya Sivêrek-Hilwanê yek bû. Generalên faşîst îca temaşâ tatbiqata wê heremê kirin.

Cunta faşîst, tatbiqata 'Sancar 85' û operasyona 'Güneş (Ro)' bî hev re domand. Cuntayê operasyona 'Güneş' lî herema navçeyên Licê, Kulpê, Hênê û Hezroyê pêkani. Çend Apoyiyên ku bî salan

lî wê heremê lî çiyân bûn, çûn xwe spartî cuntayê. Lî ser vê yekê cuntayê lî vanderdorî operasyona 'Güneş' bî pêk ani. Bî sedan gundiye'n heremê girtî û bîrî bajarê Diyarbekirê. Niha lî wê heremê cuntayê pîraniya gunden dager kirîye. Dî dibîstanên gundan de qereqolên xwe daniye. Bî vê operasyonê, jî nav

bajarê Diyarbekirê jî bê hejmar kesên welatperez jî girtî û avêtî zindanan.

Ev jî dîde xuhiyakirin, ku her çiqas cunta hêz be jî, jî tekoşîna netewe yê Kurd gelek fikar dike û dîtirse. Jî vê sedemê jî, jî her alive êriş dike. Dî nav hev de tatbiqat û operasyonan pêk tîne. Lê, rastiye heye, ku cunta jî baş pê dîzane, bî tatbiqat û operasyonan tekoşîna netewe yê Kurd naye rawestandî û şikestî. Serketî û serfirazî ya netewên bindestî û ya çîna karker û xebatkarî in!

TIRS BERÊ MIRINÊ NAGRE

Serokwezîrê Tirkîyê Turgut Özal, jî bo parastîna xwe Parêzgerê'n taybetî bî kar tîne. Çendek berê Turgut Özal derket gerê û çû Kurdistanê. Lî mitîng û meydanên ku Turgut Özal tê de beşdar dibû; derê hêzên polis û leşker, grûbeke parazkar yê taybetî wî dîparast. Ew kesên parêzger hemû nişandarên bî nav û deng in. Dema ku Serokwezîr cîvanan çêdîke an jî dî mitîndan de beşdar dibe, bî sed metran der û dor lî serokwezîr digrî û hemû kûçe û kolanan dîkin bî kontrola xwe. Nayêlî lî der dorê kêç bifre.

Ev rewş baş dîde diyarkirin, ku serokwezîrê nijadperest û paşverû, jî gelê Kurd gelek dîtirse. Jî Şahê Îranê, pirtîr û hêztî kesê hêzên parêzger bî kar ne ani. Dawî bî serê xwe ma û revî. Gotîneke bav û kalan heye " tîrs berê mirinê nagre!"



FERHENGA BERBANGÊ

Xwendevanên hêja!

Redaksiyona me, hewcdariya ferhenga Berbangê dit. Ji ber ku piraniya nwisaran de gelek beje derbaz dibin, ku hinek xwendevanên me tenagihin. Di hinek hevokan de ji bêje di manekê din de tîn bi kar anin. Hinek hevalên nwisar ji bêjeyên biyani bi kar tinin. Ji ber ku xwendin û nwisandina kurdi ji peşve ne çûye, xwendevan di vi wari de zehmeti dîkşinin. Ew bêjen ku em di ferhenga Berbangê de binwisinin û biweşinin xweza dê hemû ne bi kurdi bin, dê yên biyani ji hebin.

Ji vê hejmarê ha şûnde ew bêjeyên mane granên ku di nwisaran de derbaz dibin; em dê li gor alfabetik wan rez bikin.

A	Deng: Ray, oy	Kirdayet: Hukumet
Abori: Ekonomi	Destmiz: Ucret	L
Ambargo: Rawestandina danûstendinê	Dewlemend: Zengin	Landik: Dergoşk, beşik
Amerika Yekbûyi: USA	Dîsojin: Dîşewitîn	
Axaftin: Peyvandin, qisekirin, dengkirin	Dehbe: Hov	
	Dil: Esir	M
	Diyari: Xelat odul	
	Doz: Dawa	Merc: Şert
B		Mehani: Maaş
Balafir: Teyyare, uçak	E	Minak: Misal
Balafirgeh: Meydana balafirvan	Elind: Şefeq	Monopol: Tekel, sermayedarên mezin
Başûr: Cenup, guney	Evin: Aşq	
Balkişandin: Diqet kişandin	Endam: Aza, uye	N
Beyani: Sîbê	Eni: Cephe	Navçe: Qesebe
Berpirsiyar: Wezîfedar, sorumlu		Navnetewî: Înternasyonalî
Belengazi: Perişani	F	Nijadperestî: Irkçî, paşverû
Berberî: Zîdiyê, çelişki	Fermo: Kerem bike, buyurun	Noker: Ajan
		Nûçe: Haber
Bêje: Kelime	G	Nûner: Temsilkar
Balyozxane: Konsoloxane		
Biryar: Qerar	Guman: Şuphe	P
Biryara 24 ê Çile: Lî Tirkîyê biryara abori.		Pejirandin: Qebulkirin
Bûyer: Qewmandin, olay		Parêzger: Muhafîz
C	H	O
Cıvak: Topluluk, cemat	Hevok: Cumle	Qedexe: Yasak
Cıvin: Toplantı, kombûn	Helbest: Şiir	
	Hêzênerdê: Hêzênerşahi, karakuvvetler	
Ç	Hêja: Bî qîmet	R
Çapxane: Matbaa	Hilbijartin: Nîqandin, seçim	Rexne: Eleştiri.
Çin: Sınıf	Hoviti: Wahşet	Rewşa awerte: Orfî idare
Çirok: Hikaye		Rêz: Sıra, satır
	K	Ris: Tazi
D	Karxane: Fabrika	Rojname: Gazete
Dadgeh: Mahkeme	Komar: Cumhuriyet	Rûber: Çem
Dagerker: İşgalkar		

S

Sazgeh: Muessese, kurum
Seyr: Ecayib
Seden: Sebep
Sero kwezir: Stadminister, başbakan

Ş

Şêwrûmîşawre: Danîşma, mujûlbûn

T

Tana: Parastin
Tax: Mahle
Teşe: Form, şekil
Terazûn: Butçe
Tevdil: Haziri
Tekoşin: Mucadele
Tixûb: Sinor
Tûjandin: Îfade

X

Xızani: Feqiri
Xwirist: Tebie, surist

Z

Zanîngêh: Universite
Zagon: Qanûn
Zirof: Rewş, durum

" GUNDÊ ME GELO "

Gundê me gelo
Li serî rûbar e
Li piştê çîya ye
Rojekê yê ava ye û hîzara alifê ba ye

Gundê me gelo
Li dora kanî ne
Li rexa zevî ne
Zevî û bêder in
Dehbe lê diçer in
Gundî dibirsîne
Gundî di têhnîne

Li gundê me gelo
Şivanê ris e
Yê bê kepen e
Hirî weris e
Vekêş gerden e

Li Gundê me gelo
Lay-lay... hewarin
Narîn... zêmarin
Landik rejîne
Zarok disotîne

Li gundê me gelo
Hemî dil rojin
Hemî binefş û nêrgiz û bişkojin
Û hêşta şev e
Û hêşta rev e
Û hêşta me û buhara hîvî ya
Xewneka geleka dûr e ev e.

1979
DÎHOK

" NIHA LI CÎHANÊ LI 40 CÎYAN
ŞER AN JÎ XWÎNRÊTIN DOM DIKIN "

Dî roja 18 ê Îlonê 1985 an de rojna-
ma swêdi AFTONBLADET vê sernivi-
sara ha ya jorin dîmîvisand.

Wek tê zanin roja 18 ê Îlomê, ji aliyê
Koma Netewan ve, roja "aştiyê" tê pejr-
randin û piroz kirin. Dî vê roja aştiya
cihanê de, rojnama Aftonblad, li ser
xerita cihanê, 40 ciyên ku iro şer li wir
dom dikin bi hejmaran îşaret kirî bû.
Dî wan 40 ciyên şerê de, du (2) ci ji,
Kurdistan bi xwe bû. Rojnamê, ciyên
şerê, kî't'a bi kî't'a beş kirî bûn. Dî beşa
Ewropayê de Tûrkiye ji hebû. Rojnamê,
dî xala Tûrkiyê de dîmîvisandin, ku "li
Tûrkiyê, li dij hêzên cuntayê, şerê ber-
xwedana kurdan dom dike." Û dî beşa
Asiyayê de ji, li Îraqê çala şerê navbera
pêşmêrgan û hêzên leşkerên Îraqê dîkir.

" Stranek ji bo zarokên Kurd li cejna ji dayikbûna wan "

Mamo Şivan...
Li cejnên bûna, li vî welatî.
Çira disojin.
Lê li warê me gunda disojin!

Mamo Şivan...
Li cejnên bûna, li vî welatî.
Kê ka dibirin.
Lê li gundê me..
Sera dibirin!

Mamo Şivan...
Li cejnên bûna, li vî welatî
Ji lêvên şîşa "vîn" di barît.
Ji yê mirova...
Stran û peste dibarin.
Lê li xopana welatê me,
Ji gewriyên top û firoka..
Agir û bombe dibarin.
Ji axê dest û pê difirin..
Lê hûn dê jîn û na mirin!

1984
Stockholm

MUÊYEDTEYIB

MASSKORSBAND



M. Aî - GUNDÊ ŞEWÎ